



Chapa taybet: chile 2008

© Brûsk AGIRÎ

PÊSHGOTIN

Rêziman, di pêvajoya êvolîsîyona zimanan da, bere-bere pêkhatin. Bi zêde bûna peyvan, rêz û rêzik jî pê ra zêde bûn. Him ziman, him jî rêziman – wek hemû tishtên sirishtî – guherbar in. Ev guherbarî bi awayek giran û rêkûpêk tê holê.

Dema mirovan dest bi nivîsînê kirin, girîngîya zelal kirina rêzimanan jî derket holê û pê ra jî prosesa zelal kirina rêzimanan dest pê kir. Ewropîyan chend sed sal berê, jibo zimanên xu, dest bi vî karî kirin. Mixabin rewşa zimanê me cuda bû. Dijminên gelê Kurd, bi hemû îmkana û teknîkên xu yên asîmîlasîyonê, xastin zimanê me ji holê rakin. Lê jiber xurt bûna bingeha vî zimanê kevn ew serneketin, dê tu car jî sernekevin.

Xebatên li ser rêzimana Kurdî gelek dereng destpêkirin. Ew rûmetbilindên ku dest bi vî karî kirin, jiber tunebûna îmkanan, jiber hezar û yek asteng û pirsgerêkên ku li pêsh wan bûn, nikarîbûn xebatek rêkûpêk pêkbînin. Lê xizmeta ku wan di nav ewchend zehmetî û dijwarîyan da kirin, bêguman, xizmetek giranbaha bû. Em deyndar û sipasdarên wan in!

Rêziman bi zimanê dema xu va girêdayî ye. Jiber vê yekê, ev pirtûka di destê we da, ligor Kurdîya îroyîn û jibo, bi her awayî, zelal kirina rêzimana Kurdî hatîye nivîsîn. Hemû beshên rêzimanî yek bi yek hatine hûnandin. Ger tishtên ku me ji bîr kiribin hebin, jibo chapên din, hûn dikarin me haydar bikin; em dê wan jî lê zêde bikin.

Termên rêzimanî yê ku di vê pirtûkê da cî digirin, hin ji wan, ligor fonksîyonên wan, min xu chêkirin, hin ji wan Latînî ne, hin ji wan jî mamoste M.E. Bozarslan ji min ra shandin. Ez carek din, ji mamoste Bozarslan ra, sipasdarîya xu dîyar dikim!

Brûsk AGIRÎ

NAVEROK

	<u>rûpel</u>
ALFABET	8
KARPEYV	9
nûdem	9
- karpeyvên nerêzdar	9
- karpeyvên rêzdar	18
- karpeyvên sazber	24
- karpeyvên veqetbar	27
- neyînîya karpeyvan	28
pêshedem	31
mêjedem	38
- karpeyvên derbasok	38
- karpeyvên nederbasok	40
mêjedema nêzîk	42
- karpeyvên derbasok	42
- karpeyvên nederbasok	47
- neyînîya karpeyvan	51
mêjedema dûr	52
- karpeyvên derbasok	52
- karpeyvên nederbasok	57
- neyînîya karpeyvan	61
mêjedema chîrokî	62
- karpeyvên derbasok	62
- karpeyvên nederbasok	67
- neyînîya karpeyvan	71

nûdema chîrokî	72
- karpeyvên derbasok	72
- karpeyvên nederbasok	75
- neyînîya karpeyvan	79
pêshedema chîrokî	80
- karpeyvên derbasok	80
- karpeyvên nederbasok	85
- neyînîya karpeyvan	89
pêshedema dûr	90
- karpeyvên derbasok	90
- karpeyvên nederbasok	92
- neyînîya karpeyvan	95
pêshedema dûr a chîrokî	96
- karpeyvên derbasok	96
- karpeyvên nederbasok	98
- neyînîya karpeyvan	101
awayê fermanîyê	102
awayê pêwistîyê	103
awayê daxazîyê	105
awayê xazîyê	107
forma pasîf	109
NAV	111
navên nêrîn	111
navên mêyîn	112
nav ne di hevbendîyê da	116
nav di rewsha hevbendîyê da	125
nav di rewsha bang lê kirinê da	129
navên bêalî	131
karanîna hejmaran	134
SALIXNAV	136

BENDIK	143
pêshbendik	143
cotbendik	145
SHÛNNAV	147
shûnnavên kesanî	147
shûnnavên xadîtî	149
shûnnavên nîshankî	150
shûnnavên dorkî	152
shûnnavên hevbendîyê	153
shûnnavên nenas	154
PIRSPEYV	155
SALIXPEYV	160
TEVOKBEND	164
BANGPEYV	168
PÊSHEK Û PÊVEK	170
TEVOKSAZÎ	173
HEJMAR/JIMAR	179
RÊZEJIMAR	181
NÎSHANOKÊN XANDINÊ	183
LÎSTA TERMÊN RÊZIMANÎ	185

ALFABETA KURDÎ	
1	a
2	b
3	c
4	ch/ç
5	d
6	e
7	ê
8	f
9	g
10	h
11	i
12	î
13	j
14	k
15	l
16	m
17	n
18	o
19	p
20	q
21	r
22	s
23	sh/ş
24	t
25	u
26	û
27	v
28	w
29	x
30	y
31	z

NÛDEM

Di nûdemê da tewandina karpeyvî ligor subjektê dibe. Subjekt di nûdemê da nakeve forma zayendê, û ger ne di hevbendîyê da be, nakeve forma pirranîyê jî. Yekanî an pirranîya subjektê karpeyvî diyar dike.

Karpeyvên nerêzdar

Karpeyvên ku koka wan ji rêzê der e, karpeyvên nerêzdar in.

Karpeyvên nerêzdar ev in:

- jîbil “mîrîn”ê, hemû karpeyvên ku bi “-in” diqedin (ne karpeyvên ku bi “-andin” diqedin)
- hemû karpeyvên ku bi “-ûn” diqedin
- *man, nîyan, zan* (hemû karpeyvên din ên ku bi “-an” diqedin, karpeyvên rêzdar in)
- *anîn, danîn, girîn, jîn, rrîn* (hemû karpeyvên din ên ku bi “-în” diqedin, karpeyvên rêzdar in)

<i>ajotin, alastin, avêtin, bihîstin, bijartin, birashtin, birin, dîtin, dotin, fîrotin, girtin, givashtin, gîhîshtin, gotin, hîshtin, jîmartin, ketin, kirin, kotin, kushtin, lîstin, mêtin, mîstin, parastin, perestîn, rûnishtin, sipartin, sotin, shûshtin, xarin, xastin, xistin</i>

<i>bûn (bûyîn), chûn (chûyîn), hebûn</i>
--

<i>anîn, danîn, girîn, jîn, rrîn</i>

<i>man (mayîn), nîyan, zan (zayîn)</i>
--

karpeyv	kok	karpeyv	kok
alastin	alês	jimartin	jimêr
avêtin	avêj	ketin	kev
bihîstin	bihîs	kirin	k
bijartin	bijêr	kotin	koj
birashtin	birêsh	kushtin	kuj
birin	b	lîstin	lîz
bûn	b	man	mîn
chûn	ch	mêtin	mêj
dîtin	bîn	mîstin	mîz
dotin	dosh	nîyan	n
fîrotin	fîrosh	parastin	parêz
gîhîshtin	gîhîj	perestin	perêz
girtin	gir	sipartin	sipêr
givashtin	givêsh	sotin	soj
gotin	bêj	xastin	xaz
hîshtin	hêl	xistin	x

Tewandina karpeyvan:

	dîtin	rêz
ez	dibînim	di + kok + im
tu	dibînî	di + kok + î
ew	dibîne	di + kok + e
em	dibînin	di + kok + in
hûn	dibînin	di + kok + in
ew	dibînin	di + kok + in

	avêtin	bijartin	birin	chûn	girtin	hîştin
ez	diavêjim	dibijêrim	dibim	dichim	digirim	dihêlim
tu	diavêjî	dibijêrî	dibî	dichî	digirî	dihêlî
ew	diavêje	dibijêre	dibe	diche	digire	dihêle
em	diavêjin	dibijêrin	dibin	dichin	digirin	dihêlin
hûn	diavêjin	dibijêrin	dibin	dichin	digirin	dihêlin
ew	diavêjin	dibijêrin	dibin	dichin	digirin	dihêlin

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin - y: Ez trêngehê jî vir dibînim.
- p: Em trêngehê jî vir dibînin.
- y: Ka bibêje tu chi dibînî?
- p: Ka bibêjin hûn chi dibînin?
man - y: Ew îro li ba hevalên xu dimîne.
- p: Ew îro li ba hevalên xu dimînin.
- y: Rojîn îro li ba hevalên xu dimîne.
- p: Rojîn û Berfîn îro li ba hevalên xu dimînin.
bihîstin - y: Ez te dibihîsim.
- p: Em te dibihîsin.
chûn - y: Hêlîn tenê diche dibistanê.
- p: Hêlîn û Azad tev dichin dibistanê.
kirin - y: Her kes karê xu dike.
lîstin - y: Zarok li lîstikgehê dilîze.
- p: Zarok li lîstikgehê dilîzin.
- y: Zaroka te li lîstikgehê dilîze.
- p: Zarokên te li lîstikgehê dilîzin.
sipartin - y: Kurd xu disipêre chîyayan.
- p: Kurd xu disipêrin chîyayan.
xastin - y: Tu chi dixazî?
- p: Hûn chi dixazin?

Tewandina van karpeyvên jêrîn cuda ye:

karpeyv	kok	karpeyv	kok
ajotin	ajo	shûshtin	sho
girîn	girî	xarin	xu
jîn	jî	zan	zê
rrîn	rrî		

shûshtin		rêz
ez	dishom	di + kok + m
tu	disho	di + kok
ew	disho	di + kok
em	dishon	di + kok + n
hûn	dishon	di + kok + n
ew	dishon	di + kok + n

	ajotin	girîn	jîn	xarin	shûshtin
ez	diajom	digirîm	dijîm	dixum	dishom
tu	diajo	digirî	dijî	dixu	disho
ew	diajo	digirî	dijî	dixu	disho
em	diajon	digirîn	dijîn	dixun	dishon
hûn	diajon	digirîn	dijîn	dixun	dishon
ew	diajon	digirîn	dijîn	dixun	dishon

y: yekanî
p: pirranî

- ajotin - y: Hêvî otomobîlê bash diajo.
 - p: Hêvî û Robîn otomobîlê bash diajon.
- girîn - y: Pitik dîsa digirî.
 - p: Pitik dîsa digirîn.
- jîn - y: Dapîra min hê dijî.
 - p: Dapîr û bavpîrê min hê dijîn.
- shûshtin - y: Mîro fereyan disho.
 - p: Mîro û Zinar fereyan dishon.
- xarin - y: Zarok fêkî dixu.
 - p: Zarok fêkî dixun.

Ev karpeyvên jêrîn pêsheka nûdemê (di-) nagirin:

bûn, nînîn, hatin, anîn, danîn, hebûn, tunîn

	bûn	nînîn*	hatin	anîn	danîn	hebûn	tunîn*
ez	im/me	nînim	têm	tînim	datînim	heme	tunim
tu	î/yî	nînî	tê	tînî	datînî	heyî	tunî
ew	e/ye	nîne	tê	tîne	datîne	heye	tune
em	in/ne	nînin	tên	tînin	datînin	hene	tunin
hûn	in/ne	nînin	tên	tînin	datînin	hene	tunin
ew	in/ne	nînin	tên	tînin	datînin	hene	tunin

y: yekanî
p: pirranî

- bûn
- y: Ez Berfîn in.
 - p: Em Dilba û Berfîn in.
 - y: Ez Dilba me.
 - p: Em Berfîn û Dilba ne.
 - y: Tu Berfîn î.
 - p: Hûn Dilba û Berfîn in.
 - y: Tu Dilba yi.
 - p: Hûn Berfîn û Dilba ne.
 - y: Ew Berfîn e.
 - p: Ew Dilba û Berfîn in.
 - y: Ew Dilba ye.
 - p: Ew Berfîn û Dilba ne.
 - y: Ez gundî me.
 - p: Em gundî ne.
 - y: Tu xandekar î.
 - p: Hûn xandekar in.
 - y: Ew xandekar e.
 - p: Ew xandekar in.
 - y: Îro yekshem e.
 - y: Îro shemî ye.
 - y: Hefteyek heft roj e.
 - p: Du hefte 14 roj in.
 - y: Hîvek 4 hefte ye.
 - p: Du hîv 8 hefte ne.
 - y: Pirtûka min li ser maseyê ye.
 - p: Pirtûkên min li ser maseyê ne.

hatin	- y: <u>Xandekar</u> ji dibistanê <u>tê</u> . - p: <u>Xandekar</u> ji dibistanê <u>tên</u> .
anîn	- y: <u>Garson</u> xarinê <u>tîne</u> . - p: <u>Garson</u> xarinê <u>tînin</u> . - y: <u>Garsona rûken</u> xarinê <u>tîne</u> . - p: <u>Garsonên rûken</u> xarinê <u>tînin</u> .
danîn	- y: <u>Lorîn</u> guldankan <u>datîne</u> ser maseyan. - p: <u>Lorîn û Evîn</u> guldankan <u>datînin</u> ser maseyan.
hebûn	- y: <u>Ez</u> tim <u>heme</u> . - p: <u>Em</u> tim <u>hene</u> . - y: <u>Tu</u> tim <u>heyî</u> . - p: <u>Hûn</u> tim <u>hene</u> . - y: <u>Ew</u> tim <u>heye</u> . - p: <u>Ew</u> tim <u>hene</u> . - y: <u>Pirtûk</u> <u>heye</u> . - p: <u>Pirtûk</u> <u>hene</u> . - y: <u>Pirtûka min</u> <u>heye</u> . - p: <u>Pirtukên min</u> <u>hene</u> . - y: <u>Pirtûkek min</u> <u>heye</u> . - p: <u>Pirtûkên min</u> <u>hene</u> . - y: <u>Her kes îro</u> <u>heye</u> . - y: <u>Zarokek wan</u> <u>heye</u> . - p: <u>Du zarokên wan</u> <u>hene</u> .
tunîn	- y: <u>Shîlan</u> îro <u>tune</u> . - p: <u>Shîlan û Dîlan</u> îro <u>tunin</u> .

Jêrenot:

nînîn*	: Ev karpeyv tenê di <i>nûdemê</i> da tê karanîn.
tunîn*	: Ev karpeyv tenê di <i>nûdemê</i> da tê karanîn. Di demên din da, di forma <i>tunebûn</i> 'ê da tê karanîn.

Karpeyvên rêzdar

Karpeyvên ku koka wan ji rêzê ne der e, karpeyvên rêzdar in.

Karpeyvên rêzdar ev in:

- hemû karpeyvên ku bi “-andin” diqedin
- jibil “anîn, danîn, girîn, jîn, rrîn”, hemû karpeyvên ku bi “-în” diqedin
- jibil “man, nîyan, zan”, hemû karpeyvên ku bi “-an” diqedin

Peydakirina koka karpeyvê: “-în, -an” û “-andin” ji dawîya karpeyvê tê avêtin.

karpeyvên nederbasok	karpeyvên derbasok	kok
alîn	alandin	al
barîn	barandin	bar
cemidîn	cemidandin	cemid
chêrîn	chêrandin	chêr
domîn	domandin	dom
êshîn	êshandin	êsh
fetisîn	fetisandin	fetis
gerîn	gerandin	ger
helîn	helandin	hel
kelîn	kelandin	kel
mêjîn	mêjandin	mêj
peritîn	peritandin	perit
qêrîn	qêrandin	qêr
revîn	revandin	rev

sekinîn shikîn tevizîn westîn xapîn	sekinandin shikandin tevizandin westandin xapandin	sekin shik teviz west xap
	chandin sitandin shandin xandin*	ch sit sh xûn
dan (dayîn) dêran gêran (gerandin) kêshan (kishandin) kolan kutan pêjan (pijandin)		d dêr gêr kêsh kol kut pêj
birrîn chinîn karîn kirrîn nêrîn nivîsîn rêsîn zanîn		birr chin kar kirr nêr nivîs rês zan

Karpeyvên ku bi “-în” û “-an” diqedin:

zanîn		rêz
ez	dizanim	di + kok + im
tu	dizanî	di + kok + î
ew	dizane	di + kok + e
em	dizanin	di + kok + in
hûn	dizanin	di + kok + in
ew	dizanin	di + kok + in

	karîn	ramîn	sekinîn	kirrîn
ez	dikarim	diramim	disekinim	dikirrim
tu	dikarî	diramî	disekinî	dikirrî
ew	dikare	dirame	disekine	dikirre
em	dikarin	diramin	disekinin	dikirrin
hûn	dikarin	diramin	disekinin	dikirrin
ew	dikarin	diramin	disekinin	dikirrin

	herîn*	nêrîn	kêshan
ez	diherim	dinêrim	dikêshim
tu	diherî	dinêrî	dikêshî
ew	dihere	dinêre	dikêshe
em	diherin	dinêrin	dikêshin
hûn	diherin	dinêrin	dikêshin
ew	diherin	dinêrin	dikêshin

Karpeyvên ku bi “-andin” diqedin:

	shandin	rêz
ez	dishînim	di + kok + înim
tu	dishînî	di + kok + înî
ew	dishîne	di + kok + îne
em	dishînin	di + kok + înin
hûn	dishînin	di + kok + înin
ew	dishînin	di + kok + înin

	chandin	shikandin	mêjandin	revandin	xandin*
ez	dichînim	dishikînim	dimêjînim	direvînim	dixûnim
tu	dichînî	dishikînî	dimêjînî	direvînî	dixûnî
ew	dichîne	dishikîne	dimêjîne	direvîne	dixûne
em	dichînin	dishikînin	dimêjînin	direvînin	dixûnin
hûn	dichînin	dishikînin	dimêjînin	direvînin	dixûnin
ew	dichînin	dishikînin	dimêjînin	direvînin	dixûnin

y: yekanî
p: pirranî

- barîn - y: Baran gurr dibare.
chêrîn - y: Chêlek li mêrgê dichêre.
- p: Chêlek li mêrgê dichêrin.
- y: Chêleka we li mêrgê dichêre.
- p: Chêlekên we li mêrgê dichêrin.
êshîn - y: Serê min diêshe.
- y: Diranê wê diêshe.
- p: Diranên wê diêshin.
kalîn - y: Mî jibo berxa xu dikale.
- p: Mî jibo berxên xu dikalin.
nêrîn - y: Ez li jêr dinêrim.
- p: Em li jêr dinêrin.
nivîsîn - y: Robîn nameyan dinivîse.
- p: Robîn û Botan nameyan dinivîsin.
peyvîn - y: Kechik bi hevala xu ra dipeyve.
- p: Kechik bi hevala xu ra dipeyvin.
- y: Kechik bi hevalên xu ra dipeyve.
- p: Kechik bi hevalên xu ra dipeyvin.
ramîn - y: Tu chima wisa kûr diramî?
- p: Hûn chima wisa kûr diramin?
zanîn - y: Kî bersîva vê pirsê dizane?
- p: Kî bersîva vê pirsê dizanin?
domandin - y: Komela me karên xu bash didomîne.
- p: Komelên me karên xu bash didomînin.
chêrandin - y: Berxvan berxan dichêrîne.
- p: Berxvan berxan dichêrînin.

- kishandin - y: Tûrîst wêneyên avahîyên kevn dikishîne.
 - p: Tûrîst wêneyên avahîyên kevn dikishînin.
- mêjandin - y: Dayik pitika xu dimêjîne.
 - p: Dayik pitikên xu dimêjînin.
- parzandin - y: Gulê shîr diparzîne.
 - p: Gulê û Zela shîr diparzînin.
- sekinandin - y: Polîs me dîsa disekinîne.
 - p: Polîs me dîsa disekinînin.
- shandin - y: Shoresh ji Gulistanê ra tim nameyan dishîne.
 - p: Shoresh û Gulistan ji hev ra tim nameyan dishînin.
- xemilandin- y: Hîvbanû xu jibo dîlanê dixemilîne.
 - p: Hîvbanû û Zerya xu jibo dîlanê dixemilînin.

Jêrenot:

Xandin*: Awayê tewandina vê karpeyvê, di nûdemê da, di pêvajoya ziman da guherîye.

Herîn* : Ev karpeyv tenê di *nûdem* û *pêshedemê* da tê karanîn, û awayê neyîn ê vê karpeyvê tune.

Karpeyvên sazber

Karpeyvên ku pêshek girtine, û karpeyvên ku ji yekî zêdetir peyvan pêkhatine, karpeyvên sazber in.

da-	dadan, dagirtin, daketin, daxistin...
hil-	hildan, hilhatin, hilkishîn, hilpekîn...
ra-	rabûn, radan, ragîhandin, raketin, rakirin, razan...
tê-	têchûn, têgîhîstîn, têketin, têkoshîn, têxistin, têwerdandin...
têk-	têkchûn, têkdan, têkbirin
ve-	vebûn, vedan, vegerandin, vegerîn, vejandin, vejîn, vekirin, vemirandin, vemirîn, verijîn, veshartin, vexandin, vexarin...
vê-	vêketin, vêxistin
wer-	wergerîn, wergêran / wergerandin...
ba	badan, babûn, bakirin
baz	bazdan
bar	barkirin
ber	beravêtin, berdan
ber + xu	berxudan
bîn	bînbûn, bînketin, bînkirin...
bîr	bîranîn, bîrkirin
chê	chêbûn, chêkirin
dar + da	dardakirin
der	deranîn, derchûn, derketin, derkirin, derxistin...
dest	destdan, destketin, destxistin...
dûr	dûrketin, dûrkirin, dûrxistin...
girê	girêdan

jê	jêkirin
kar	karanîn
mist	mistdan
ne + xash	nexashketin
rû	rûdan
rûn	rûnishtin (rûn + nishtin, “n”yek ketîye
pash	pashketin
pev	pevchûn
pê	pêkirin
pêk	pêkanîn, pêkhatin
pêsh	pêshketin
rê	rêchûn, rêdan, rêketin, rêkirin, rêxistin...
ser	serketin

	karanîn (nerêzdar)	rûnishtin (nerêzdar)	vegerîn (rêzdar)	vemirandin (rêzdar)
ez	kartînim	rûdinê	vedigerim	vedimirînim
tu	kartînî	rûdinê	vedigerî	vedimirînî
ew	kartîne	rûdinê	vedigere	vedimirîne
em	kartînin	rûdinên	vedigerin	vedimirînin
hûn	kartînin	rûdinên	vedigerin	vedimirînin
ew	kartînin	rûdinên	vedigerin	vedimirînin

bakirin Kechik ji bavê xu ra destê xu badike.
 dadan Dayê sobeyê dadide.
 hilkishîn Havînan gelek ciwan hildikishin chîyayan.
 veshartin Dapîra min diravê xu di bin dosheka xu da vedishêre.
 vexistin Em agir vêdixin.
 bîrnanîn Kurd her sal komkujîya Helepcheyê bîrtînin.
 chêkirin Rojda xarinê chêdike.
 karanîn Hûn kîjan metodê kartînin?
 pêkirin Ez solên xu pêdikim.
 rêketin Em di demok 4'an da rêdikevin.

Karpeyvên veqetbar

Karpeyvên sazber ên ku bi “lê” destpêdikin, karpeyvên veqetbar in. Di karanîna van karpeyvên da peyvek din dikare têkeve navbera “lê” û karpeyvê.

Hin karpeyvên ku bi “lê” destpêdikin:

lêanîn, lêchûn, lêdan, lêhatin, lêgerîn, lêkolan, lêketin, lêkirin, lêxistin...

lêanîn	lêchûn	lêgerîn	lêketin	lêxistin
li ... anîn	li ... chûn	li ... gerîn	li ... ketin	li ... xistin

Dayik kremê li lashê pitikê dide.

Tu li chi digerî?

Kechik û lawik li hev dixin.

Lorîn tim kincên delal li xu dike.

Wekî din, karpeyvên wek “*bergerîn, berketin, destpêkirin, hînbûn, hînkirin, kêrhatin, rasthatin, serdan, tevbûn...*” jî karpeyvên veqetbar in:

destpêkirin	bergerîn	berketin	rasthatin
dest bi ... kirin	ber ... gerîn	ber ... ketin	rastî ... hatin

Kendal sibê dest bi dibistanê dike.

Kechik, jibo kincên nû, ber dayika xu digere.

Meta min gelek ber kecha xu ya nexash dikeve.

Ez li dikanê rastî meta xu hatim.

Em hînî zimanê Kurdî dibin.

Neyînîya karpeyvan

Awayê neyînîya karpeyvan, di nûdemê da, jibil karpeyvên nerêzdar ên ku pêsheka nûdemê nagirin, wek hev e.

Wekî din, jibil du karpeyvan, hemû karpeyvên din pêsheka “na-” digirin, û “na-” di shûna “di-” da tê karanîn. Ger karpeyv sazber be, “-na-” dikeve navberê.

e: erêyîn

n: neyîn

chûn	- e: Ez dichim gund. - n: Ez nachim gund.
shûshtin	- e: Delal fereyan disho . - n: Delal fereyan nasho .
chêkirin	- e: Ew xarinê chê dikin . - n: Ew xarinê chên akin .
rûnishtin	- e: Zarok li hundir rû dinên . - n: Zarok li hundir rû nanên .
peyvîn	- e: Mamoste xash dipeyve . - n: Mamoste xash napeyve .
barîn	- e: Berf îro pirr dibare . - n: Berf îro pirr nabare .
xandin	- e: Xezal dîsa dixûne . - n: Xezal dîsa naxûne .
xebitîn	- e: Karyar bash dixebitin . - n: Karyar bash naxebitin .
shandin	- e: Ew zarokan dishîne lîstikgehê. - n: Ew zarokan nashîne lîstikgehê.
sekinandin	- e: Polîs me disekinîne . - n: Polîs me nasekinîne .

Ev her du karpeyvên jêrê, di rewsha neyîn da, pêsheka “ni-” digirin.

	erêyîn	neyîn
karîn	Ez d ikarim.	Ez n ikarim.
zanîn	Ez d izanim.	Ez n izanim.

Neyînîya karpeyvên nerêzdar ên ku pêsheka nûdemê nagirin:

	hatin		anîn		danîn	
	erêyîn	neyîn	erêyîn	neyîn	erêyîn	neyîn
ez	têm	nayêm	tînim	naynim	datînim	danaynim
tu	tê	nayê	tînî	naynî	datînî	danaynî
ew	tê	nayê	tîne	nayne	datîne	danayne
em	tên	nayên	tînin	naynin	datînin	danaynin
hûn	tên	nayên	tînin	naynin	datînin	danaynin
ew	tên	nayên	tînin	naynin	datînin	danaynin

	bûn (erêyîn)	nînîn (neyîn)	hebûn (erêyîn)	tunîn (neyîn)
ez	im/me	nînim	heme	tunim
tu	î/yî	nînî	heyî	tunî
ew	e/ye	nîne	heye	tune
em	in/ne	nînin	hene	tunin
hûn	in/ne	nînin	hene	tunin
ew	in/ne	nînin	hene	tunin

e: erêyîn
n: neyîn

- | | |
|---------------|---|
| hatin | - e: Em ji shanogehê tên . |
| | - n: Em ji shanogehê neyên . |
| anîn | - e: Garson xarinê tîne . |
| | - n: Garson xarinê neyne . |
| danîn | - e: Hêvî guldankê datînê ser maseyê. |
| | - n: Hêvî guldankê danayne ser maseyê. |
| karanîn | - e: Xandekar ferhengan kartînin . |
| | - n: Xandekar ferhengan karnaynin . |
| bûn – nînîn | - e: Ez Berfîn im . |
| | - n: Ez Berfîn nînim . |
| hebûn - tunîn | - e: Pirtûka min heye . |
| | - n: Pirtûka min tune . |

PÊSHEDEM

Pêshedem bi du awayan dîyar dibe: bi peyva “dê” û bi karpeyva “kirin”ê.

Peyva “dê” di zimanê devkî da pirranî wek “ê” tê karanîn.

Karpeyva “kirin”ê jibo rewshên ese tê karanîn.

Awayê tewandina karpeyvvan di pêshedemê da wek *nûdemê* ye; tenê li shûna “di-” pêsheka “bi-” tê karanîn. Di awayê neyîn da, li shûna “bi-” “ne-” tê karanîn. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

e: erêyîn

n: neyîn

kirin	- e: Ez dê bikim . - n: Ez dê nekim .
chûn	- e: Nermîn dê îro biche Amedê. - n: Nermîn dê îro neche Amedê.
birin	- e: Shîrîn dê zarokan bibe dibistanê. - n: Shîrîn dê zarokan nebe dibistanê.
xandin	- e: Ez dê vê pirtûkê bixûnim . - n: Ez dê vê pirtûkê nexûnim .
xastin	- e: Kurd dê mafên xu bixazin . - n: Kurd dê mafên xu nexazin .
nivîsîn	- e: Rojda dê helbestan binivîse . - n: Rojda dê helbestan nenivîse .
xebitîn	- e: Alan dê shemîyê bixebite . - n: Alan dê shemîyê nexebite .
chinîn	- e: Ew dê îro zevîyê bichinin . - n: Ew dê îro zevîyê nechinin .

- gîhîn - e: Em **dê** bigîhin trêênê.
 - n: Em **dê** negîhin trêênê.
 shandin - e: Em **dê** hevalekî bishînin.
 - n: Em **dê** hevalekî neshînin.
 shikandin - e: Ew **dê** îcar dilê hev bishikînin.
 - n: Ew **dê** îcar dilê hev neshikînin.

Karpeyvên sazber:

Di pêshedemê da karanîna “-bi-” ne jibo hemû karpeyvên sazber pêwist e, lê dikare bê karanîn.

e: erêyîn

n: neyîn

- chêkirin - e: Ez **dê** xarinê chêkim.
 - n: Ez **dê** xarinê chênekim.
 vegerîn - e: Shîlan **dê** roja shemîyê vegere.
 - n: Shîlan **dê** roja shemîyê venegere.
 vêxistin - e: Adar **dê** lampê vêxe.
 - n: Adar **dê** lampê vênexe.
 berdan - e: Ew **dê** girtîyan berdin.
 - n: Ew **dê** girtîyan bernedin.
 rûnishtin - e: Mêvan **dê** li ser paldankan rûnên.
 - n: Mêvan **dê** li ser paldankan rûnenên.
 rêketin - e: Em **dê** sibê rêkevin.
 - n: Em **dê** sibê rênekevin.
 dûrketin - e: Ew **dê** ji vir dûrkevin.
 - n: Ew **dê** ji vir dûrnekevin.
 girêdan - e: Xezal **dê** porê xu girêde.
 - n: Xezal **dê** porê xu girênedede.

Ev karpeyvên jêrîn him tewandina wan cuda ye, him jî pêsheka pêshedemê (bi-) nagirin:

		hatin		anîn	
		erêyîn	neyîn	erêyîn	neyîn
ez	dê	bêm	neyêm	bînim	neynim
tu	dê	bê	neyê	bînî	neynî
ew	dê	bê	neyê	bîne	neyne
em	dê	bên	neyên	bînin	neynin
hûn	dê	bên	neyên	bînin	neynin
ew	dê	bên	neyên	bînin	neynin

		danîn	
		erêyîn	neyîn
ez	dê	daynim	daneynim
tu	dê	daynî	daneynî
ew	dê	dayne	daneyne
em	dê	daynin	daneynin
hûn	dê	daynin	daneynin
ew	dê	daynin	daneynin

		hebûn (erêyîn)	tunebûn (neyîn)
ez	dê	hebim	tunebim
tu	dê	hebî	tunebî
ew	dê	hebe	tunebe
em	dê	hebin	tunebin
hûn	dê	hebin	tunebin
ew	dê	hebin	tunebin

bûn				
			erêyîn	neyîn
ez	dê	...	bim	nebim
tu	dê	...	bî	nebî
ew	dê	...	be	nebe
em	dê	...	bin	nebin
hûn	dê	...	bin	nebin
ew	dê	...	bin	nebin

			herîn*	werîn*
ez	dê		herim	werim
tu	dê		herî	werî
ew	dê		here	were
em	dê		herin	werin
hûn	dê		herin	werin
ew	dê		herin	werin

Jêrenot:

Herîn* : Ev karpeyv tenê di *nûdem* û *pêshedemê* da tê karanîn.

Werîn* : Ev karpeyv tenê di *pêshedemê* da tê karanîn.

Awayê neyîn ê her du karpeyvan jî tune. Jibo *herîn*, awayê neyîn ê *chûn*'ê, û jibo *werîn*, awayê neyîn ê *hatin*'ê tê karanîn.

e: erêyîn

n: neyîn

hatin

- e: Ez **dê** sibê **bêm**.

- n: Ez **dê** sibê **neyêm**.

anîn

- e: Baran **dê** zarokan êvarê **bîne**.

- n: Baran **dê** zarokan êvarê **neyne**.

karanîn

- e: Em **dê** vê metodê **karbînin**.

- n: Em **dê** vê metodê **karneynin**.

hebûn

- e: Zelal jî **dê** di civînê da **hebe**.

- n: Zelal jî **dê** di civînê da **tunebe**.

bûn

- e: Zarok **dê** di Newrozê da li vir **bin**.

- n: Zarok **dê** di Newrozê da li vir **nebin**.

herîn

- e: Em **dê** **herin**.

- n: Em **dê** **nechin**.

(nechin: neyînîya “chûn”ê)

werîn

- e: Em **dê** **werin**.

- n: Em **dê** **neyên**.

(neyên: neyînîya “hatin”ê)

Dîyar kirina *pêshedemê* bi karpeyva “kirin”ê:

Ger mirov *pêshedemê* bi karpeyva “kirin”ê dîyar bike, wê gavê ev karpeyv shûna “dê” digire . Awayê tewandina vê karpeyvê di *pêshedemê* da, wek awayê *nûdemê* ye.

Dîyar kirina *pêshedemê* bi karpeyva “kirin”ê jibo rewshên ese tê karanîn.

e: erêyîn

n: neyîn

kirin	- e: Ez dikim bikim. - n: Ez dikim nekim.
chûn	- e: Nermîn dike îro biche Amedê. - n: Nermîn dike îro neche Amedê.
birin	- e: Shîrîn dike zarokan bibe dibistanê. - n: Shîrîn dike zarokan nebe dibistanê.
xandin	- e: Ma tu dikî vê pirtûkê bixûnî ? - n: Ma tu dikî vê pirtûkê nexûnî ?
xastin	- e: Kurd dikin mafên xu bixazin . - n: Kurd dikin mafên xu nexazin .
nivîsîn	- e: Rojda dike helbestan binivîse . - n: Rojda dike helbestan nenivîse .
xebitîn	- e: Alan dike shemîyê bixebite . - n: Alan dike shemîyê nexebite .
kirrîn	- e: Ez dikim vê gustîla zîv bikirrim . - n: Ez dikim vê gustîla zîv nekirrim .
shikandin	- e: Ew dikin îcar dilê hev bishikînin . - n: Ew dikin îcar dilê hev neshikînin .

dadan	- e: Ez dikim sobeyê dadim. - n: Ez dikim sobeyê danedim .
vegerîn	- e: Shîlan dike roja shemîyê vegere. - n: Shîlan dike roja shemîyê venegere .
vêxistin	- e: Ez dikim cigareya xu vêxim. - n: Ez dikim cigareya xu venexim .
berdan	- e: Ew dikin girtîyan berdin. - n: Ew dikin girtîyan bernedin .
rûnishtin	- e: Mêvan dikin li derva rûnên. - n: Mêvan dikin li derva rûnenên .
rêketin	- e: Em dikin îshev rêkevin. - n: Em dikin îshev rênekevin .
dûrketin	- e: Ew dikin ji vir dûrkevin. - n: Ew dikin ji vir dûrnekevin .
girêdan	- e: Xezal dike porê xu girêde. - n: Xezal dike porê xu girê nede .
hatin	- e: Ez dikim sibê bêm . - n: Ez dikim sibê neyêm .
anîn	- e: Baran dike zarokan êvarê bîne . - n: Baran dike zarokan êvarê neyne .
karanîn	- e: Em dikin vê metodê karbînin . - n: Em dikin vê metodê karneynin .
hebûn	- e: Zelal jî dike di civînê da hebe .
tunebûn	- n: Zelal jî dike di civînê da tunebe .

MÊJEDEM

Di mêjedemê da hemû karpeyv rêzdar in. Lê du cûr **shûnnavên kesanî** wek *subjekt* tên karanîn.

shûnnavên kesanî jibo karpeyvên derbasok						
min	te	wî/wê		me	we	wan

shûnnavên kesanî jibo karpeyvên nederbasok						
ez	tu	ew		em	hûn	ew

Di mêjedemê da heft dem hene:

- mêjedema nêzîk
- mêjedema dûr
- mêjedema chîrokî
- nûdema chîrokî
- pêshedema chîrokî
- pêshedema dûr
- pêshedema dûr a chîrokî

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina karpeyvên derbasok ne ligor subjektê, lê ligor objekta dîrekt tê kirin. Objekta dîrekt di mêjedemê da, di rewsha karpeyvên derbasok da, nakeve forma zayendê û ger ne di hevbendîyê da be, nakeve forma pirranîyê jî. Yekanî an pirranîya objekta dîrekt karpeyv dîyar dike.

Peyda kirina koka karpeyvvan:

Karpeyvên ku bi “-in” û “-andin” diqedin: “-in” ji dawîya karpeyvê tê avêtin.

Hemû karpeyvên din: “-n” ji dawîya karpeyvê tê avêtin.

Karpeyvên ku bi “-andin” diqedin, hemû *karpeyvên derbasok* in.

Hin mînak:

karpeyv	kok	karpeyv	kok
avêtin	avêt	dan	da
dîtin	dît	dadan	dada
fîrotin	fîrot	kêshan	kêsha
gotin	got	kutan	kuta
jimartin	jimart	vedan	veda
kirin	kir	wergêran	wergêra
parastin	parast		
shûshtin	shûsht	anîn	anî
veshartin	veshart	birrîn	birrî
		chinîn	chinî
êshandin	êshand	danîn	danî
gerandin	gerand	karanîn	karanî
helandin	heland	karîn	karî
kelandin	keland	kirrîn	kirrî
qedandin	qedand	nêrîn	nêrî
revandin	revand	nivîsîn	nivîsî
shandin	shand	rêsin	rêsi
xandin	xand	zanîn	zanî
wergerandin	wergerand		

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina karpeyvên nederbasok ligor subjektê dibe. Subjekt di mêjedemê da, di rewsha karpeyvên nederbasok da, nakeve forma zayendê û ger ne di hevbendîye da be, nakeve forma pirranîyê jî. Yekanî an pirranîya subjektê karpeyv dîyar dike.

Peyda kirina koka karpeyvvan:

Karpeyvên ku bi “-in” diqedin: “-in” ji dawîya karpeyvê tê avêtin.

Hemû karpeyvên din: “-n” ji dawîya karpeyvê tê avêtin.

Karpeyvên yek û du-tîke, yên ku bi “-în” diqedin, pêveka “-ya” li koka wan tê zêde kirin. Di rewsha karpeyvên sazber da, ger peyva bingeh ji yek an ji du tîkeyan pêkbê, koka karpeyvê dîsa pêveka “-ya” digire.

Chend mînak:

barîn	êshîn	girîn	kenîn	ramîn
barî + ya	êshî + ya	girî + ya	kenî + ya	ramî + ya

peyvîn	revîn	qedîn	xapîn	weshîn
peyvî + ya	revî + ya	qedî + ya	xapî + ya	weshî + ya

bergerîn	hilkishîn	vegerîn	vejîn
bergerî + ya	hilkishî + ya	vegerî + ya	vejî + ya

Hin mînak:

karpeyv	kok	karpeyv	kok
daketin	daket	barîn	barîya
dûrketin	dûrket	chêrîn	chêrîya
gîhîshtin	gîhîsht	êshîn	êshîya
hatin	hat	firrîn	firrîya
hilhatin	hilhat	girîn	girîya
ketin	ket	helîn	helîya
pêkhatin	pêkhat	jîyan	jîya
raketin	raket	kelîn	kelîya
rêketin	rêket	kenîn	kenîya
rûnishtin	rûnisht	peyvîn	peyvîya
vêketin	vêket	qedîn	qedîya
		qêrîn	qêrîya
bûn	bû	ramîn	ramîya
chêbûn	chêbû	revîn	revîya
chûn	chû	rizîn	rizîya
hebûn	hebû	shikîn	shikîya
rabûn	rabû	verijîn	verijîya
tunebûn	tunebû	wergerîn	wergerîya
vebûn	vebû	westîn	westîya
		weshîn	weshîya
man	ma	xapîn	xapîya
razan	raza	xurîn	xurîya
zan	za		
		herikîn	herikî
		sekinîn	sekinî
		shewitîn	shewitî
		shimitîn	shimitî
		xebitîn	xebitî

MÊJEDEMA NÊZÎK

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

anîn

... ez	anîm	(kok + m)
... tu	anî	(kok)
... ew	anî	(kok)
... em	anîn	(înfînitîf)
... hûn	anîn	
... ew	anîn	

shandin

... ez	shandim	(kok + im)
... tu	shandî	(kok + î)
... ew	shand	(kok)
... em	shandin	(înfînitîf)
... hûn	shandin	
... ew	shandin	

	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... ez	birim	rêkirim	berdam	nivîsîm
... tu	birî	rêkirî	berda	nivîsî
... ew	bir	rêkir	berda	nivîsî
... em	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... hûn	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... ew	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	gerandim	kenandim	westandim
... tu	gerandî	kenandî	westandî
... ew	gerand	kenand	westand
... em	gerandin	kenandin	westandin
... hûn	gerandin	kenandin	westandin
... ew	gerandin	kenandin	westandin

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin - y: Min tû di trêne da dîtî.
- p: Min hûn di trêne da dîtîn.
- y: Wî ez di trêne da dîtîn.
- p: Wî em di trêne da dîtîn.
- y: Me ew di trêne da dîtî.
- p: Me ew di trêne da dîtîn.
- y: Min Xezal li dibistanê dîtî.
- p: Min Xezal û Serbest li dibistanê dîtîn.
- anîn - y: Nazdarê pirtûk anî.
- p: Nazdarê pirtûk anîn.
- nivîsîn - y: Lorînê ew helbest nivîsî.
- p: Lorînê ew helbest nivîsîn.
- birin - y: Wî kechik bir sînemayê .
- p: Wî kechik birin sînemayê.
- gerandin - y: Wê zarok gerand.
- p: Wê zarok gerandin.
- gotin - y: Me ew tîşt ji wan ra got.
- p: Me ew tîşt ji wan ra gotin.
- xarin - y: Nazê sêv xar.
- p: Nazê sêv xarin.
- kirrîn - y: Min ev gul ji te ra kirrî.
- p: Min ev gul ji te ra kirrîn.
- y: Min ev gula sor ji te ra kirrî.
- p: Min ev gulên sor ji te ra kirrîn.

Objekta dîrekt dikare, di forma “ew” da, veshartî jî bê karanîn. Wê gavê, di yekanîyê da tenê koka karpeyvê û di pirranîyê da karpeyv înfînitîf tê karanîn.

		anîn		shandin	
		yekanî	pirranî	yekanî	pirranî
min	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
te	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
wî	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
wê	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
me	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
we	(ew)	anî	anîn	shand	shandin
wan	(ew)	anî	anîn	shand	shandin

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin
- y: Min dît.
 - p: Min dîtin.
 - y: Min ew dît.
 - p: Min ew dîtin.
 - y: Min pirtûk dît.
 - p: Min pirtûk dîtin.
 - y: Min Goran dît.
 - p: Min Goran û Rizgar dîtin.
- anîn
- y: Nazdarê ji dibistanê anî.
 - p: Nazdarê ji dibistanê anîn.
 - y: Nazdarê zarok ji dibistanê anî.
 - p: Nazdarê zarok ji dibistanê anîn.
- nivîsîn
- y: Min ji birayê xu ra nivîsî.
 - p: Min ji birayên xu ra nivîsîn.
 - y: Min ew name ji birayê xu ra nivîsî.
 - p: Min ew name ji birayên xu ra nivîsîn.
- birin
- y: Wî bir sînemayê.
 - p: Wî birin sînemayê.
 - y: Wî kechik bir sînemayê.
 - p: Wî kechik birin sînemayê.
 - y: Wî Bahar bir sînemayê.
 - p: Wî Bahar û Xezal birin sînemayê.
- gotin
- y: Me ji wan ra got.
 - p: Me ji wan ra gotin.
 - y: Me ew tisht ji wan ra got.
 - p: Me ew tisht ji wan ra gotin.

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	hatim	(kok + im)
tu	hatî	(kok + î)
ew	hat	(kok)

em	hatin	(înfînîtîf)
hûn	hatin	
ew	hatin	

rûnishtin

ez	rûnishtim	(kok + im)
tu	rûnishtî	(kok + î)
ew	rûnisht	(kok)

em	rûnishtin	(înfînîtîf)
hûn	rûnishtin	
ew	rûnishtin	

bûn

ez	bûm	(kok + m)
tu	bû	(kok)
ew	bû	(kok)

em	bûn	(înfîntîf)
hûn	bûn	
ew	bûn	

sekinîn

ez	sekinîm	(kok + m)
tu	sekinî	(kok)
ew	sekinî	(kok)

em	sekinîn	(înfîntîf)
hûn	sekinîn	
ew	sekinîn	

revîn

ez	revîyam	(kok + ya + m)
tu	revîya	(kok + ya)
ew	revîya	(kok + ya)

em	revîyan	(kok + ya + n)
hûn	revîyan	
ew	revîyan	

	rêketin	man	chûn	rabûn
ez	rêketim	mam	chûm	rabûm
tu	rêketî	ma	chû	rabû
ew	rêket	ma	chû	rabû
em	rêketin	man	chûn	rabûn
hûn	rêketin	man	chûn	rabûn
ew	rêketin	man	chûn	rabûn

	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
ez	shimitîm	ricifîm	qefilîm	arimîm
tu	shimitî	ricifî	qefilî	arimî
ew	shimitî	ricifî	qefilî	arimî
em	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
hûn	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
ew	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn

	jîn	kenîn	vegerîn	xapîn
ez	jîyam	kenîyam	vegerîyam	xapîyam
tu	jîya	kenîya	vegerîya	xapîya
ew	jîya	kenîya	vegerîya	xapîya
em	jîyan	kenîyan	vegerîyan	xapîyan
hûn	jîyan	kenîyan	vegerîyan	xapîyan
ew	jîyan	kenîyan	vegerîyan	xapîyan

hatin	<u>Ez</u> do <u>hatim</u> .
rêketin	<u>Ew</u> di demok 6'an da <u>rêketin</u> .
rûnishtin	<u>Mêvan</u> li derva <u>rûnishtin</u> .
bûn	<u>Dapîra min</u> do <u>bû</u> 99 salî.
chûn	<u>Gulan</u> pêr <u>chû</u> Amedê.
vebûn	<u>Derîyên giran</u> hêdî hedî <u>vebûn</u> .
man	<u>Em</u> du demokan li benda trêne <u>man</u> .
zan	<u>Cînara me</u> <u>za</u> û jê ra kechikek bû.
qefilîn	Hewa îro sar bû, <u>zarok</u> gelek <u>qefilîn</u> .
shimitîn	<u>Lingê wî</u> <u>shimitî</u> û li ser pishtê ket erdê.
xebitîn	<u>Ew</u> îro, ji sibê heta êvarê, bê sekin <u>xebitîn</u> .
barîn	<u>Berf</u> îro pirr <u>barîya</u> .
girîn	<u>Pitik</u> îshev tim <u>girîya</u> .
jîyan	<u>Dapîra min</u> têra xu <u>jîya</u> .
kenîn	<u>Zarok</u> îro xash <u>kenîyan</u> .
ramîn	<u>Ez</u> li ser vê mijarê pirr <u>ramîyam</u> .
xapîn	<u>Tu</u> dîsa <u>xapîya</u> .

Neyînîya karpeyvvan

Di awayê neyîn da karpeyv pêsheka “ne-” digirin. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê. Wekî din tishtek naguhere.

Min tu li bajar nedîtî.
Wî em bi otomobîlê nebirin.
Kechikan sêv nexarin.

Ew di demok 6’an da rêneketin.
Mêvan li derva rûnenishtin.
Ez li ser vê mijarê pirr neramîyam.
Zarok îro neqefilîn.

MÊJEDEMA DÛR

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

anîn

... ez	anîme	(kok + me)
... tu	anîyî	(kok + yî)
... ew	anîye	(kok + ye)
... em	anîne	(înfînîtîf + e)
... hûn	anîne	
... ew	anîne	

shandin

... ez	shandime	(kok + ime)
... tu	shandîyî	(kok + îyî)
... ew	shandîye	(kok + îye)
... em	shandin	(înfînîf + e)
... hûn	shandin	
... ew	shandin	

	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... ez	birime	rêkirime	berdame	nivîsîme
... tu	birîyî	rêkirîyî	berdayî	nivîsîyî
... ew	birîye	rêkirîye	berdaye	nivîsîye
... em	birine	rêkirine	berdane	nivîsîne
... hûn	birine	rêkirine	berdane	nivîsîne
... ew	birine	rêkirine	berdane	nivîsîne

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	gerandime	kenandime	westandime
... tu	gerandîyî	kenandîyî	westandîyî
... ew	gerandîye	kenandîye	westandîye
... em	gerandine	kenandine	westandine
... hûn	gerandine	kenandine	westandine
... ew	gerandine	kenandine	westandine

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin - y: Wî tu di trêne da dîtîyî.
- p: Wî hûn di trêne da dîtîne.
- y: Wê ez di trêne da dîtîye.
- p: Wê em di trêne da dîtîne.
- y: Wan ew di trêne da dîtîye.
- p: Wan ew di trêne da dîtîne.
- anîn - y: Gulanê lawik ji dibistanê anîye.
- p: Gulanê lawik ji dibistanê anîne.
- nivîsîn - y: Shermînê ew helbest nivîsîye.
- p: Shermînê ew helbest nivîsîne.
- birin - y: Dîlanê ew bi otomobîlê birîye dibistanê.
- p: Dîlanê ew bi otomobîlê birîne dibistanê.
- gerandin - y: Dayê zarok gerandîye.
- p: Dayê zarok gerandîne.
- xarin - y: Shevîne sêv xarîye.
- p: Shevîne sêv xarine.
- y: Kechikan sêv xarîye.
- p: Kechikan sêv xarine.
- kirrîn - y: Min ev gul ji te ra kirrîye.
- p: Min ev gul ji te ra kirrîne.
- y: Min ev gula sor ji te ra kirrîye.
- p: Min ev gulên sor ji te ra kirrîne.

Ger objekta dîrekt di rewsha “ew” da veshartî be:

		anîn		shandin	
		<i>yekanî</i>	<i>pirranî</i>	<i>yekanî</i>	<i>pirranî</i>
min	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
te	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
wî	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
wê	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
me	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
we	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine
wan	(ew)	anîye	anîne	shandîye	shandine

y: yekanî
p: pirranî

- | | |
|---------|---|
| xandin | - y: Min <u>xandîye</u> .
- p: Min <u>xandine</u> .
- y: Min <u>ew pirtûk xandîye</u> .
- p: Min <u>ew pirtûk xandine</u> . |
| anîn | - y: Gulanê ji dibistanê <u>anîye</u> .
- p: Gulanê ji dibistanê <u>anîne</u> .
- y: Gulanê <u>zarok</u> ji dibistanê <u>anîye</u> .
- p: Gulanê <u>zarok</u> ji dibistanê <u>anîne</u> . |
| nivîsîn | - y: Wê ji meta xu ra <u>nivîsîye</u> .
- p: Wê ji metên xu ra <u>nivîsîne</u> .
- y: Wê <u>ew name</u> ji meta xu ra <u>nivîsîye</u> .
- p: Wê <u>ew name</u> ji metên xu ra <u>nivîsîne</u> . |
| birin | - y: Wî bi otomobîlê <u>birîye</u> .
- p: Wî bi otomobîlê <u>birine</u> .
- y: Wî <u>ew</u> bi otomobîlê <u>birîye</u> .
- p: Wî <u>ew</u> bi otomobîlê <u>birine</u> .
- y: Wî <u>Bahar</u> bi otomobîlê <u>birîye</u> .
- p: Wî <u>Bahar û Adar</u> bi otomobîlê <u>birine</u> . |
| xarin | - y: Zarokan <u>xarîye</u> .
- p: Zarokan <u>xarine</u> .
- y: Zarokan <u>zebesh xarîye</u> .
- p: Zarokan <u>zebesh xarine</u> . |
| gotin | - y: Mîro ji wan ra <u>gotîye</u> .
- p: Mîro ji wan ra <u>gotine</u> .
- y: Mîro <u>ew tisht</u> ji wan ra <u>gotîye</u> .
- p: Mîro <u>ew tisht</u> ji wan ra <u>gotine</u> . |

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	hatime	(kok + ime)
tu	hatîyî	(kok + îyî)
ew	hatîye	(kok + îye)
em	hatine	(înfînitîf + e)
hûn	hatine	
ew	hatine	

rûnishtin

ez	rûnishtime	(kok + ime)
tu	rûnishtîyî	(kok + îyî)
ew	rûnishtîye	(kok + îye)
em	rûnishtine	(înfînitîf + e)
hûn	rûnishtine	
ew	rûnishtine	

bûn

ez	bûme	(kok + me)
tu	bûyî	(kok + yî)
ew	bûye	(kok + ye)
em	bûne	(înfîntîf + e)
hûn	bûne	
ew	bûne	

sekinîn

ez	sekinîme	(kok + me)
tu	sekinîyî	(kok + yî)
ew	sekinîye	(kok + ye)
em	sekinîne	(înfîntîf + e)
hûn	sekinîne	
ew	sekinîne	

revîn

ez	revîyame	(kok + ya + me)
tu	revîyayî	(kok + ya + yî)
ew	revîyaye	(kok + ya + ye)
em	revîyane	(kok + ya + ne)
hûn	revîyane	
ew	revîyane	

	rêketin	man	chûn	rabûn
ez	rêketime	mame	chûme	rabûme
tu	rêketîyî	mayî	chûyî	rabûyî
ew	rêketîye	maye	chûye	rabûye
em	rêketine	mane	chûne	rabûne
hûn	rêketine	mane	chûne	rabûne
ew	rêketine	mane	chûne	rabûne

	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
ez	shimitîme	ricifîme	qefilîme	arimîme
tu	shimitîyî	ricifîyî	qefilîyî	arimîyî
ew	shimitîye	ricifîye	qefilîye	arimîye
em	shimitîne	ricifîne	qefilîne	arimîne
hûn	shimitîne	ricifîne	qefilîne	arimîne
ew	shimitîne	ricifîne	qefilîne	arimîne

	jîn	kenîn	vegerîn	xapîn
ez	jîyame	kenîyame	vegerîyame	xapîyame
tu	jîyayî	kenîyayî	vegerîyayî	xapîyayî
ew	jîyaye	kenîyaye	vegerîyaye	xapîyaye
em	jîyane	kenîyane	vegerîyane	xapîyane
hûn	jîyane	kenîyane	vegerîyane	xapîyane
ew	jîyane	kenîyane	vegerîyane	xapîyane

hatin	<u>Ew</u> do <u>hatîye</u> .
rêketin	<u>Ew</u> di demok 6'an da <u>rêketine</u> .
rûnishtin	<u>Mêvan</u> li derva <u>rûnishtine</u> .
bûn	<u>Dapîra wê</u> do <u>bûye</u> 99 salî.
chûn	<u>Gulan</u> pêr <u>chûye</u> Amedê.
vebûn	<u>Deriyên giran</u> hêdî hedî <u>vebûne</u> .
man	<u>Shevîn û Shoresh</u> du demokan li benda trêne <u>mane</u> .
zan	<u>Cînara me zaye</u> û jê ra kechikek bûye.
qefilîn	Hewa sar bûye, û <u>zarok</u> gelek <u>qefilîne</u> .
shimitîn	<u>Lingê wî shimitîye</u> û li ser pishtê ketîye erdê.
xebitîn	<u>Ew îro, ji sibê heta êvarê, bê sekin xebitîne</u> .
barîn	<u>Berf îro</u> pirr <u>barîyaye</u> .
girîn	<u>Pitik îshev</u> tim <u>girîyaye</u> .
jîn	<u>Dapîra wî</u> têra xu <u>jîyaye</u> .
kenîn	<u>Zarok îro</u> xash <u>kenîyane</u> .
ramîn	<u>Ez</u> li ser vê mijarê pirr <u>ramîyame</u> .
xapîn	<u>Tu dîsa</u> <u>xapîyayî</u> .

Neyînîya karpeyvvan

Jibo neyînîya karpeyvvan pêsheka “ne-” tê karanîn. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Gulanê lawik ji dibistanê neanîye.

Kechikan sêv nexarine.

Min ew pirtûk nexandine.

Mîro her tisht ji wan ra negotîye.

Mêvan li derva rûnenishtine.

Ew di demok 6'an da rêneketine.

Berf îro pirr nebarîyaye.

MÊJEDEMA CHÎROKÎ

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

anîn

... ez	anîbûm	(kok + bûm)
... tu	anîbû	(kok + bû)
... ew	anîbû	(kok + bû)
... em	anîbûn	(kok + bûn)
... hûn	anîbûn	
... ew	anîbûn	

shandin

... ez	shandibûm	(kok + ibûm)
... tu	shandibû	(kok + ibû)
... ew	shandibû	(kok + ibû)
... em	shandibûn	(kok + ibûn)
... hûn	shandibûn	
... ew	shandibûn	

	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... ez	biribûm	rêkiribûm	berdabûm	nivîsîbûm
... tu	biribû	rêkiribû	berdabû	nivîsîbû
... ew	birbû	rêkiribû	berdabû	nivîsîbû
... em	biribûn	rêkiribûn	berdabûn	nivîsîbûn
... hûn	biribûn	rêkiribûn	berdabûn	nivîsîbûn
... ew	biribûn	rêkiribûn	berdabûn	nivîsîbûn

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	gerandibûm	kenandibûm	westandibûm
... tu	gerandibû	kenandibû	westandibû
... ew	gerandibû	kenandibû	westandibû
... em	gerandibûn	kenandibûn	westandibûn
... hûn	gerandibûn	kenandibûn	westandibûn
... ew	gerandibûn	kenandibûn	westandibûn

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin - y: Min tu li Amedê dîtîbû.
- p: Min hûn li Amedê dîtîbûn.
- y: Te ez li Amedê dîtîbûm.
- p: Te em li Amedê dîtîbûn.
- y: Min Xezal li Amedê dîtîbû.
- p: Min Xezal û Serbest li Amedê dîtîbûn.
- anîn - y: Shîrînê ez ji dibistanê anîbûm.
- p: Shîrînê em ji dibistanê anîbûn.
- nivîsîn - y: Zeryayê ew helbest nivîsîbû.
- p: Zeryayê ew helbest nivîsîbûn.
- birin - y: Wî ez bi otomobîlê birîbûm kar.
- p: Wî em bi otomobîlê birîbûn kar.
- gerandin - y: Te zarok gerandibû.
- p: Te zarok gerandibûn.
- xarin - y: Berfînê sêva sor xarîbû.
- p: Berfînê sêvên sor xarîbûn.
- y: Kechikan sêv xarîbû.
- p: Kechikan sêv xarîbûn.
- kirrîn - y: Min ev gul ji te ra kirrîbû.
- p: Min ev gul ji te ra kirrîbûn.
- y: Min ev gula sor ji te ra kirrîbû.
- p: Min ev gulên sor ji te ra kirrîbûn.

Ger objekta dîrekt di rewsha “ew” da veshartî bê karanîn:

		anîn		shandin	
		<i>yekanî</i>	<i>pirranî</i>	<i>yekanî</i>	<i>pirranî</i>
min	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
te	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
wî	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
wê	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
me	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
we	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn
wan	(ew)	anîbû	anîbûn	shandibû	shandibûn

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin
- y: Min dîtibû.
 - p: Min dîtibûn.
 - y: Min ew dîtibû.
 - p: Min ew dîtibûn.
 - y: Min pirtûk dîtibû.
 - p: Min pirtûk dîtibûn.
 - y: Min Goran dîtibû.
 - p: Min Goran û Rizgar dîtibûn.
- anîn
- y: Gulanê ji dibistanê anîbû.
 - p: Gulanê ji dibistanê anîbûn.
 - y: Gulanê zarok ji dibistanê anîbû.
 - p: Gulanê zarok ji dibistanê anîbûn.
- nivîsîn
- y: Min ji xûshka xu ra nivîsîbû.
 - p: Min ji xûshkên xu ra nivîsîbûn.
 - y: Min ew name ji xûshka xu ra nivîsîbû.
 - p: Min ew name ji xûshkên xu ra nivîsîbûn.
- birin
- y: Wî bi otomobîlê biribû.
 - p: Wî bi otomobîlê biribûn.
 - y: Wî ew bi otomobîlê biribû.
 - p: Wî ew bi otomobîlê biribûn.
 - y: Wî Bahar bi otomobîlê biribû.
 - p: Wî Bahar û Adar bi otomobîlê biribûn.

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	hatibûm	(kok + ibûm)
tu	hatibû	(kok + ibû)
ew	hatibû	(kok + ibû)

em	hatibûn	(kok + ibûn)
hûn	hatibûn	
ew	hatibûn	

rûnishtin

ez	rûnishtibûm	(kok + ibûm)
tu	rûnishtibû	(kok + ibû)
ew	rûnishtibû	(kok + ibû)

em	rûnishtibûn	(kok + ibûn)
hûn	rûnishtibûn	
ew	rûnishtibûn	

bûn

ez	bûbûm	(kok + bûm)
tu	bûbû	(kok + bû)
ew	bûbû	(kok + bû)

em	bûbûn	(kok + bûn)
hûn	bûbûn	
ew	bûbûn	

sekinîn

ez	sekinîbûm	(kok + bûm)
tu	sekinîbû	(kok + bû)
ew	sekinîbû	(kok + bû)

em	sekinîbûn	(kok + bûn)
hûn	sekinîbûn	
ew	sekinîbûn	

revîn

ez	revîyabûm	(kok + ya + bûm)
tu	revîyabû	(kok + ya + bû)
ew	revîyabû	(kok + ya + bû)

em	revîyabûn	(kok + ya + bûn)
hûn	revîyabûn	
ew	revîyabûn	

	rêketin	man	chûn	rabûn
ez	rêketibûm	mabûm	chûbûm	rabûm
tu	rêketibû	mabû	chûbû	rabû
ew	rêketibû	mabû	chûbû	rabû
em	rêketibûn	mabûn	chûbûn	rabûn
hûn	rêketibûn	mabûn	chûbûn	rabûn
ew	rêketibûn	mabûn	chûbûn	rabûn

	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
ez	shimitîbûm	ricifîbûm	qefilîbûm	arimîbûm
tu	shimitîbû	ricifîbû	qefilîbû	arimîbû
ew	shimitîbû	ricifîbû	qefilîbû	arimîbû
em	shimitîbûn	ricifîbûn	qefilîbûn	arimîbûn
hûn	shimitîbûn	ricifîbûn	qefilîbûn	arimîbûn
ew	shimitîbûn	ricifîbûn	qefilîbûn	arimîbûn

	jîn	kenîn	vegerîn	xapîn
ez	jîyabûm	kenîyabûm	vegerîyabûm	xapîyabûm
tu	jîyabû	kenîyabû	vegerîyabû	xapîyabû
ew	jîyabû	kenîyabû	vegerîyabû	xapîyabû
em	jîyabûn	kenîyabûn	vegerîyabûn	xapîyabûn
hûn	jîyabûn	kenîyabûn	vegerîyabûn	xapîyabûn
ew	jîyabûn	kenîyabûn	vegerîyabûn	xapîyabûn

hatin	<u>Ez</u> nû <u>hatibûm</u> Amedê.
rêketin	<u>Ew</u> di demok 6'an da <u>rêketibûn</u> .
rûnishtin	<u>Mêvan</u> li derva <u>rûnishtibûn</u> .
chûn	<u>Gulan</u> dîsa <u>chûbû</u> Mahabadê.
man	<u>Em</u> du demokan li benda trêne <u>mabûn</u> .
vebûn	<u>Deriyên giran</u> hêdî hedî <u>vebûbûn</u> .
qefilîn	Hewa sar bûbû, û <u>zarok</u> gelek <u>qefilîbûn</u> .
shimitîn	<u>Lingê wî shimitîbû</u> û li ser pishtê ketibû erdê.
xebitîn	<u>Ew</u> , jî sibê heta êvarê, bê sekin <u>xebitîbûn</u> .
barîn	<u>Berf</u> dîsa pirr <u>barîyabû</u> .
girîn	<u>Pitik</u> wê shevê heta sibê <u>girîyabû</u> .
jîn	<u>Dapîra min</u> têra xu <u>jîyabû</u> .
kenîn	<u>Zarok</u> bi wê bûyerê xash <u>kenîyabûn</u> .
ramîn	<u>Ez</u> li ser wê mijarê pirr <u>ramîyabûm</u> .
xapîn	<u>Tu</u> dîsa <u>xapîyabû</u> .

Neyînîya karpeyvvan

Awayê neyîn bi pêsheka “ne-” tê kirin. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Wî tu li dibistanê **nedîtibû**.
Arjenê helbest **nenivîsibûn**.
Shevîn û Rojînê sêv **nexaribûn**.
Gulanê zarok ji dibistanê **neanîbû**.
Mêvan li derva **rûnenishtibûn**.
Derîyên giran **venebûbûn**.
Tu dîsa **nexapîyabû**.

NÛDEMA CHÎROKÎ

Di *nûdema chîrokî* da karpeyv pêsheka “di-” digirin. Ger karpeyv sazber be, “-di-” dikeve navberê. Wekî din, awayê tewandina karpeyvan wek *mêjedema nêzîk* e.

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

	<u>anîn</u>	
... ez	dianîm	(di + kok + m)
... tu	dianî	(di + kok)
... ew	dianî	(di + kok)
...		
... em	dianîn	(di + înfînîtîf)
... hûn	dianîn	
... ew	dianîn	
...		
	<u>shandin</u>	
... ez	dishandim	(di + kok + im)
... tu	dishandî	(di + kok + î)
... ew	dishand	(di + kok)
...		
... em	dishandin	(di + înfînîtîf)
... hûn	dishandin	
... ew	dishandin	

	birin	rêkirin	berdan	nivîsîn
... ez	dibirim	rêdikirim	berdidam	dinivîsîm
... tu	dibirî	rêdikirî	berdida	dinivîsî
... ew	dibir	rêdikir	berdida	dinivîsî
... em	dibirin	rêdikirin	berdidan	dinivîsîn
... hûn	dibirin	rêdikirin	berdidan	dinivîsîn
... ew	dibirin	rêdikirin	berdidan	dinivîsîn

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	digerandim	dikenandim	diwestandim
... tu	digerandî	dikenandî	diwestandî
... ew	digerand	dikenand	diwestand
... em	digerandin	dikenandin	diwestandin
... hûn	digerandin	dikenandin	diwestandin
... ew	digerandin	dikenandin	diwestandin

birin Xaya min zarok **dibirin** dibistanê.
 dîtî Min tu her roj li dibistanê **didîtî**.
 nivîsîn Wê helbest **dinivîsîn**.
 kirrîn Wî ji wê ra tim gulên sor **dikirrîn**.
 kenandin Wê em tim **dikenandin**.
 karanîn We ferhengêk chawa kardianî?
 veshartin Dapîra min diravê xu di bin dosheka xu da **vedishart**.

Ger objekta dîrekt di rewsha “ew” da veshartî be:

y: yekanî

p: pirranî

- | | |
|----------|---|
| dîtin | - y: Min <u>didît</u> .
- p: Min <u>didîtin</u> .
- y: Min <u>ew didît</u> .
- p: Min <u>ew didîtin</u> . |
| anîn | - y: Azad ji dibistanê <u>dianî</u> .
- p: Azad ji dibistanê <u>dianîn</u> .
- y: Azad <u>ew</u> ji dibistanê <u>dianî</u> .
- p: Azad <u>ew</u> ji dibistanê <u>dianîn</u> .
- y: Azad <u>zarok</u> ji dibistanî <u>dianî</u> .
- p: Azad <u>zarok</u> ji dibistanê <u>dianîn</u> . |
| nivîsîn | - y: Min ji dayika xu ra <u>dinivîsî</u> .
- p: Min ji dayika xu ra <u>dinivîsîn</u> .
- y: Min <u>ew name</u> ji dayika xu ra <u>dinivîsî</u> .
- p: Min <u>ew name</u> ji dayika xu ra <u>dinivîsîn</u> . |
| birin | - y: Wî bi otomobîlê <u>dibir</u> .
- p: Wî bi otomobîlê <u>dibirin</u> .
- y: Wî <u>ew</u> bi otomobîlê <u>dibir</u> .
- p: Wî <u>ew</u> bi otomobîlê <u>dibirin</u> . |
| xapandin | - y: Kechikan <u>dixapand</u> .
- p: Kechikan <u>dixapandin</u> .
- y: Kechikan <u>ew dixapand</u> .
- p: Kechikan <u>ew dixapandin</u> .
- y: Kechikan <u>lawik dixapand</u> .
- p: Kechikan <u>lawik dixapandin</u> . |

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	dihatim	(di + kok + im)
tu	dihatî	(di + kok + î)
ew	dihat	(di + kok)

em	dihatin	(di + înfînitîf)
hûn	dihatin	
ew	dihatin	

rûnishtin (sazber)

ez	rûdinishtim	(di + kok + im)
tu	rûdinishtî	(di + kok + î)
ew	rûdinisht	(di + kok)

em	rûdinishtin	(di + înfînitîf)
hûn	rûdinishtin	
ew	rûdinishtin	

bûn

ez	dibûm	(di + kok + m)
tu	dibû	(di + kok)
ew	dibû	(di + kok)

em	dibûn	(di + înfîntîf)
hûn	dibûn	
ew	dibûn	

sekinîn

ez	disekinîm	(di + kok + m)
tu	disekinî	(di + kok)
ew	disekinî	(di + kok)

em	disekinîn	(di + înfîntîf)
hûn	disekinîn	
ew	disekinîn	

revîn

ez	direvîyam	(di + kok + ya + m)
tu	direvîya	(di + kok + ya)
ew	direvîya	(di + kok + ya)

em	direvîyan	(di + kok + ya + n)
hûn	direvîyan	
ew	direvîyan	

	rêketin	rabûn	man	chûn
ez	rêdiketim	radibûm	dimam	dichûm
tu	rêdiketî	radibû	dima	dichû
ew	rêdiket	radibû	dima	dichû
em	rêdiketin	radibûn	diman	dichûn
hûn	rêdiketin	radibûn	diman	dichûn
ew	rêdiketin	radibûn	diman	dichûn

	shimitîn	ricifîn	qefilîn	arimîn
ez	dishimitîm	diricifîm	diqefilîm	diarimîm
tu	dishimitî	diricifî	diqefilî	diarimî
ew	dishimitî	diricifî	diqefilî	diarimî
em	dishimitîn	diricifîn	diqefilîn	diarimîn
hûn	dishimitîn	diricifîn	diqefilîn	diarimîn
ew	dishimitîn	diricifîn	diqefilîn	diarimîn

	jîn	kenîn	xapîn	vegerîn
ez	dijîyam	dikenîyam	dixapîyam	vedigerîyam
tu	dijîya	dikenîya	dixapîya	vedigerîya
ew	dijîya	dikenîya	dixapîya	vedigerîya
em	dijîyan	dikenîyan	dixapîyan	vedigerîyan
hûn	dijîyan	dikenîyan	dixapîyan	vedigerîyan
ew	dijîyan	dikenîyan	dixapîyan	vedigerîyan

hatin	<u>Ez</u> ji dibistanê dihatim .
rêketin	<u>Ew</u> tim dereng rêdîketin .
rûnishtin	<u>Mêvan</u> li derva rûdînishtin .
chûn	<u>Gulan</u> her hefte dichû Amedê.
man	<u>Em</u> bi demokan li benda trêne diman .
vebûn	<u>Derîyên giran</u> hêdî hedî vedibûn .
qefîlîn	Hewa sar dibû, û <u>zarok</u> gelek dîqefîlîn .
shimitîn	<u>Lingê wî</u> dîshimitî û li ser pishtê diket erdê.
xebitîn	<u>Ew</u> , ji sibê heta êvarê, bê sekin dixebitîn .
barîn	Berê <u>berf</u> pirr dibarîya .
girîn	<u>Pitik</u> rojên pêshîn pirr digirîya .
jîn	<u>Dapîra min</u> ligor dilê xu dijîya .
kenîn	<u>Zarok</u> xash dikenîyan .
ramîn	<u>Ez</u> li ser vê mijarê pirr diramîyam .
xapîn	<u>Tu</u> her car dixapîya .

Neyînîya karpeyvvan

Di awayê neyîn da karpeyv pêsheka “ne-” digirin. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Xaya min ez nedibirim dibistanê.

Dapîra min diravê xu di bin dosheka xu da venedishart.

Wan tishtên girîng ji me ra nedigotin.

Mêvan li derva rûnedinishtin.

Gulan her hefte nedichû Amedê.

Pitik rojên pêshîn pirr nedigirîya.

PÊSHEDEMA CHÎROKÎ

Wek di *pêshedemê* da, di *pêshedema chîrokî* da jî peyva “dê” û pêsheka “bi-” tên karanîn. Jibo gelek karpeyvên sazber karanîna “-bi-” ne pêwist e, lê dikare bê karanîn.

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

	<u>anîn</u>	
... dê ez	bianîma	(bi + kok + ma)
... dê tu	bianîya	(bi + kok + ya)
... dê ew	bianîya	(bi + kok + ya)
...		
... dê em	bianîna	(bi + kok + na)
... dê hûn	bianîna	
... dê ew	bianîna	
	<u>shandin</u>	
... dê ez	bishandama	(bi + kok + ama)
... dê tu	bishanda	(bi + kok + a)
... dê ew	bishanda	(bi + kok + a)
...		
... dê em	bishandana	(bi + kok + ana)
... dê hûn	bishandana	
... dê ew	bishandana	

	birin	rêkirin	berdan	nasîn
... ez	bibirama	rêkîrama	berdama	binasîma
... tu	bibira	rêkira	berda	binasîya
... ew	bibira	rêkira	berda	binasîya
... em	bibirana	rêkirana	berdana	binasîna
... hûn	bibirana	rêkirana	berdana	binasîna
... ew	bibirana	rêkirana	berdana	binasîna

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	bigerandama	bikenandama	biwestandama
... tu	bigeranda	bikenanda	biwestanda
... ew	bigeranda	bikenanda	biwestanda
... em	bigerandana	bikenandana	biwestandana
... hûn	bigerandana	bikenandana	biwestandana
... ew	bigerandana	bikenandana	biwestandana

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin - y: Min dê tu li pirtûkgehê bidîta.
- p: Min dê hûn li pirtûkgehê bidîtana.
- y: Te dê ez li pirtûkgehê bidîtama.
- p: Te dê em li pirtûkgehê bidîtana.
- y: Me dê ew li pirtûkgehê bidîta.
- p: Me dê ew li pirtûkgehê bidîtana.
- y: Nazê dê Xezal li pirtûkgehê bidîta.
- p: Nazê dê Xezal û Serbest li pirtûkgehê bidîtana.
- anîn - y: Xezalê dê ez ji dibistanê bianîma.
- p: Xezalê dê em ji dibistanê bianîna.
- nivîsîn - y: Min dê helbestek binivîsîya.
- p: Min dê helbest binivîsîna.
- birin - y: Wî dê ez bi otomobîlê bibirama gund.
- p: Wî dê em bi otomobîlê bibirana gund.
- gerandin - y: Min dê tu bigeranda.
- p: Min dê hûn bigerandana.
- gotin - y: Wê dê ew tisht ji me ra bigota.
- p: Wê dê ew tisht ji me ra bigotana.
- xarin - y: Kechikan dê sêva sor bixara.
- p: Kechikan dê sêvên sor bixarana.
- kirrîn - y: Min dê ew pirtûk ji te ra bikirrîya.
- p: Min dê ew pirtûk ji te ra bikirrîna.
- y: Min dê ew pirtûka chîrokan ji te ra bikirrîya.
- p: Min dê ew pirtûkên chîrokan ji te ra bikirrîna.

Ger objekta dîrekt di rewsha “ew” da veshartî be:

			anîn		shandin	
			<i>yakanî</i>	<i>pirranî</i>	<i>yekanî</i>	<i>pirranî</i>
min	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
te	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
wî	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
wê	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
me	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
we	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana
wan	dê	(ew)	bianîya	bianîna	bishanda	bishandana

y: yekanî
p: pirranî

- dîtin
- y: Min dê bidîta.
 - p: Min dê bidîtana.
 - y: Min dê ew bidîta.
 - p: Min dê ew bidîtana.
 - y: Min dê Goran bidîta.
 - p: Min dê Goran û Rizgar bidîtana.
- anîn
- y: Xezalê dê ji dibistanê bianîya.
 - p: Xezalê dê ji dibistanê bianîna.
 - y: Xezalê dê zarok ji dibistanê bianîya.
 - p: Xezalê dê zarok ji dibistanê bianîna.
- nivîsîn
- y: Min dê ji birayê xu ra binivîsîya.
 - p: Min dê ji birayên xu ra binivîsîna.
 - y: Min dê nameyek ji birayê xu ra binivîsîya.
 - p: Min dê name ji birayên xu ra binivîsîna.
- birin
- y: Wî dê bi otomobîlê bibira.
 - p: Wî dê bi otomobîlê bibirana.
 - y: Wî dê ew bi otomobîlê bibira.
 - p: Wî dê ew bi otomobîlê bibirana.
 - y: Wî dê Bahar bi otomobîlê bibira.
 - p: Wî dê Bahar û Adar bi otomobîlê bibirana.

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	dê	bihatama	(bi + kok + ama)
tu	dê	bihata	(bi + kok + a)
ew	dê	bihata	(bi + kok + a)
em	dê	bihatana	(bi + kok + ana)
hûn	dê	bihatana	
ew	dê	bihatana	

rûnishtin (sazber)

ez	dê	rûnishtama	(kok + ama)
tu	dê	rûnishta	(kok + a)
ew	dê	rûnishta	(kok + a)
em	dê	rûnishtana	(kok + ana)
hûn	dê	rûnishtana	
ew	dê	rûnishtana	

bûn

ez	dê	bibûma	(bi + kok + ma)
tu	dê	bibûya	(bi + kok + ya)
ew	dê	bibûya	(bi + kok + ya)

em	dê	bibûna	(bi + kok + na)
hûn	dê	bibûna	
ew	dê	bibûna	

sekinîn

ez	dê	bisekinîma	(bi + kok + ma)
tu	dê	bisekinîya	(bi + kok + ya)
ew	dê	bisekinîya	(bi + kok + ya)

em	dê	bisekinîna	(bi + kok + na)
hûn	dê	bisekinîna	
ew	dê	bisekinîna	

revîn

ez	dê	birevîyama	(bi + kok + ya + ma)
tu	dê	birevîya	(bi + kok + ya)
ew	dê	birevîya	(bi + kok + ya)

em	dê	birevîyana	(bi + kok + ya + na)
hûn	dê	birevîyana	
ew	dê	birevîyana	

		man	chûn	ketin
ez	dê	bimama	bichûma	biketama
tu	dê	bimaya	bichûya	biketa
ew	dê	bimaya	bichûya	biketa
em	dê	bimana	bichûna	biketana
hûn	dê	bimana	bichûna	biketana
ew	dê	bimana	bichûna	biketana

		shimitîn	ricifîn	qefilîn
ez	dê	bishimitîma	biricifîma	biqefilîma
tu	dê	bishimitîya	biricifîya	biqefilîya
ew	dê	bishimitîya	biricifîya	biqefilîya
em	dê	bishimitîna	biricifîna	biqefilîna
hûn	dê	bishimitîna	biricifîna	biqefilîna
ew	dê	bishimitîna	biricifîna	biqefilîna

		fîrrîn	vegerîn	rêketin
ez	dê	bifîrrîyama	vegerîyama	rêketama
tu	dê	bifîrrîya	vegerîya	rêketa
ew	dê	bifîrrîya	vegerîya	rêketa
em	dê	bifîrrîyana	vegerîyana	rêketana
hûn	dê	bifîrrîyana	vegerîyana	rêketana
ew	dê	bifîrrîyana	vegerîyana	rêketana

hatin	<u>Ez dê</u> do <u>bihatama</u> .
rêketin	<u>Ew dê</u> di demok 6'an da <u>rêketana</u> .
rûnishtin	<u>Mêvan dê</u> li derva <u>rûnishtana</u> .
chûn	<u>Gulan dê</u> îro <u>bichûya</u> Amedê.
man	Shevîn û Shoreshe <u>dê</u> li benda hev <u>bimana</u> .
shimitîn	<u>Lingê wî dê</u> <u>bishimitîya</u> û li ser pishtê biketa erdê.
xebitîn	<u>Ew dê</u> îro, ji sibê heta êvarê, bê sekin <u>bixebitîna</u> .
barîn	<u>Berf dê</u> îro pirr <u>bibarîya</u> .
jîn	<u>Dapîra min dê</u> têra xu <u>bijîya</u> .
kenîn	<u>Zarok dê</u> îro xash <u>bikenîyana</u> .
ramîn	<u>Ez dê</u> li ser vê mijarê pirr <u>biramîyama</u> .
xapîn	<u>Tu dê</u> dîsa <u>bixapîya</u> .

Neyînîya karpeyvvan

Awayê neyîn bi pêsheka “ne-” tê kirin û “ne-” li shûna “bi-” tê karanîn. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Te dê ez li bajar nedîtama.

Min dê ev pirtûkên chîrokan ji te ra nekirrîna.

Wî dê Bahar bi otomobîlê nebira.

Ez dê do nehatama.

Ew dê di demok 6’an da rêneketa.

Mêvan dê li derva rûnenishtana.

Gulan dê îro nechûya Amedê.

PÊSHEDEMA DÛR

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvîna da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

anîn

... dê ez	anîbim	(kok + bim)
... dê tu	anîbî	(kok + bî)
... dê ew	anîbe	(kok + be)
... dê em	anîbin	(kok + bin)
... dê hûn	anîbin	
... dê ew	anîbin	

shandin

... dê ez	shandibim	(kok + ibim)
... dê tu	shandibî	(kok + ibî)
... dê ew	shandibe	(kok + ibe)
... dê em	shandibin	(kok + ibin)
... dê hûn	shandibin	
... dê ew	shandibin	

	birin	rêkirin	berdan	nasîn
... ez	biribim	rêkiribim	berdabim	nasîbim
... tu	biribî	rêkiribî	berdabî	nasîbî
... ew	biribe	rêkiribe	berdabe	nasîbe
... em	biribin	rêkiribin	berdabin	nasîbin
... hûn	biribin	rêkiribin	berdabin	nasîbin
... ew	biribin	rêkiribin	berdabin	nasîbin

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	gerandibim	kenandibim	westandibim
... tu	gerandibî	kenandibî	westandibî
... ew	gerandibe	kenandibe	westandibe
... em	gerandibin	kenandibin	westandibin
... hûn	gerandibin	kenandibin	westandibin
... ew	gerandabin	kenandibin	westandibin

Heta hûn vegerin, min dê xarin chêkiribe.
 Shîrînê dê zarok ji dibistanê anîbin.
 Heta deh rojên din, min dê ev pirtûk hemû xandibin.
 Ger problemek derneketibe, wan dê hev niha dîtibin.
 Wan dê lawik ese shandibin gund.
 Di vê hewa xash da, berxvan dê berx xash chêrandibin.

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	dê	hatibim	(kok + ibim)
tu	dê	hatibî	(kok + ibî)
ew	dê	hatibe	(kok + ibe)

em	dê	hatibin	(kok + ibin)
hûn	dê	hatibin	
ew	dê	hatibin	

rûnishtin (sazber)

ez	dê	rûnishtibim	(kok + ibim)
tu	dê	rûnishtibî	(kok + ibî)
ew	dê	rûnishtibe	(kok + ibe)

em	dê	rûnishtibin	(kok + ibin)
hûn	dê	rûnishtibin	
ew	dê	rûnishtibin	

bûn

ez	dê	bûbim	(kok + bim)
tu	dê	bûbî	(kok + bî)
ew	dê	bûbe	(kok + be)

em	dê	bûbin	(kok + bin)
hûn	dê	bûbin	
ew	dê	bûbin	

sekinîn

ez	dê	sekinîbim	(kok + bim)
tu	dê	sekinîbî	(kok + bî)
ew	dê	sekinîbe	(kok + be)

em	dê	sekinîbin	(kok + bin)
hûn	dê	sekinîbin	
ew	dê	sekinîbin	

revîn

ez	dê	revîyabim	(kok + ya + bim)
tu	dê	revîyabî	(kok + ya + bî)
ew	dê	revîyabe	(kok + ya + be)

em	dê	revîyabin	(kok + ya + bin)
hûn	dê	revîyabin	
ew	dê	revîyabin	

		rêketin	man	chûn	jîn
ez	dê	rêketibim	mabim	chûbim	jîyabim
tu	dê	rêketibî	mabî	chûbî	jîyabî
ew	dê	rêketibe	mabe	chûbe	jîyabe
em	dê	rêketibin	mabin	chûbin	jîyabin
hûn	dê	rêketibin	mabin	chûbin	jîyabin
ew	dê	rêketibin	mabin	chûbin	jîyabin

Dema hûn bichin, ez dê nû hatibim.

Ew dê dîsa di demok 6'an da rêketibin.

Heta ez bêm, ew dê chûbe.

Ger pitik hishyar bûbe, dê niha têra xu girîyabe.

Ger astengek derneketibe, ew dê niha gîhîstibin Amedê.

Neyînîya karpeyvvan

Awayê neyîn bi pêsheka “ne-” tê kirin. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Arjenê dê helbest **nenivîsî**bin.
Shevîn û Rojînê dê sêv **nexarib**in.
Gulanê dê zarok ji dibistanê **neanî**be.

Mêvan dê li derva **rûnenishtib**in.
Zarok dê ji dibistanê hê **nehatib**in.
Tu kes dê ji vir **dûrneketib**e.

PÊSHEDEMA DÛR A CHÎROKÎ

Jibo haydarîya berfire di derbarê peydakirina koka karpeyvvan da, binêre: MÊJEDEM

Karpeyvên derbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên derbasok* ligor *objekta dîrekt* tê kirin.

anîn

... dê ez	anîbûma	(kok + bûma)
... dê tu	anîbûya	(kok + bûya)
... dê ew	anîbûya	(kok + bûya)
... dê em	anîbûna	(kok + bûna)
... dê hûn	anîbûna	
... dê ew	anîbûna	

shandin

... dê ez	shandibûma	(kok + ibûma)
... dê tu	shandibûya	(kok + ibûya)
... dê ew	shandibûya	(kok + ibûya)
... dê em	shandibûna	(kok + ibûna)
... dê hûn	shandibûna	
... dê ew	shandibûna	

	birin	rêkirin	berdan	nasîn
... ez	biribûma	rêkiribûma	berdabûma	nasîbûma
... tu	biribûya	rêkiribûya	berdabûya	nasîbûya
... ew	biribûya	rêkiribûya	berdabûya	nasîbûya
... em	biribûna	rêkiribûna	berdabûna	nasîbûna
... hûn	biribûna	rêkiribûna	berdabûna	nasîbûna
... ew	biribûna	rêkiribûna	berdabûna	nasîbûna

	gerandin	kenandin	westandin
... ez	gerandibûma	kenandibûma	westandibûma
... tu	gerandibûya	kenandibûya	westandibûya
... ew	gerandibûya	kenandibûya	westandibûya
... em	gerandibûna	kenandibûna	westandibûna
... hûn	gerandibûna	kenandibûna	westandibûna
... ew	gerandibûna	kenandibûna	westandibûna

Min dê xarin chêkiribûya.
 Shîrînê dê lawik ji dibistanê anîbûya.
 Min dê ev pirtûk hemû xandibûna.
 Wan dê hev niha dîtibûna.
 Berxvan dê berx xash chêrandibûya.

Karpeyvên nederbasok

Di mêjedemê da tewandina *karpeyvên nederbasok* ligor *subjektê* tê kirin.

hatin

ez	dê	hatibûma	(kok + ibûma)
tu	dê	hatibûya	(kok + ibûya)
ew	dê	hatibûya	(kok + ibûya)
em	dê	hatibûna	(kok + ibûna)
hûn	dê	hatibûna	
ew	dê	hatibûna	

rûnishtin (sazber)

ez	dê	rûnishtibûma	(kok + ibûma)
tu	dê	rûnishtibûya	(kok + ibûya)
ew	dê	rûnishtibûya	(kok + ibûya)
em	dê	rûnishtibûna	(kok + ibûna)
hûn	dê	rûnishtibûna	
ew	dê	rûnishtibûna	

bûn

ez	dê	bûbûma	(kok + bûma)
tu	dê	bûbûya	(kok + bûya)
ew	dê	bûbûya	(kok + bûya)
em	dê	bûbûna	(kok + bûna)
hûn	dê	bûbûna	
ew	dê	bûbûna	

sekinîn

ez	dê	sekinîbûma	(kok + bûma)
tu	dê	sekinîbûya	(kok + bûya)
ew	dê	sekinîbûya	(kok + bûya)
em	dê	sekinîbûna	(kok + bûna)
hûn	dê	sekinîbûna	
ew	dê	sekinîbûna	

revîn

ez	dê	revîyabûma	(kok + ya + bûma)
tu	dê	revîyabûya	(kok + ya + bûya)
ew	dê	revîyabûya	(kok + ya + bûya)
em	dê	revîyabûna	(kok + ya + bûna)
hûn	dê	revîyabûna	
ew	dê	revîyabûna	

		rêketin	man	chûn	jîn
ez	dê	rêketibûma	mabûma	chûbûma	jîyabûma
tu	dê	rêketibûya	mabûya	chûbûya	jîyabûya
ew	dê	rêketibûya	mabûya	chûbûya	jîyabûya
em	dê	rêketibûna	mabûna	chûbûna	jîyabûna
hûn	dê	rêketibûna	mabûna	chûbûna	jîyabûna
ew	dê	rêketibûna	mabûna	chûbûna	jîyabûna

Ez dê nû hatibûma Amedê.

Ew dê di demok 6'an da rêketibûna.

Gulan dê dîsa chûbûya Mahabadê.

Em dê du demokan li benda trêne mabûna.

Heta ez bihatama, ew dê chûbûya.

Ger pitik hishyar bibûya, dê niha têra xu girîyabûya.

Ger astengek derneketibûya, ew dê niha gîhîstibûna
Amedê.

Neyînîya karpeyvvan

Awayê neyîn bi pêsheka “ne-” tê kirin. Ger karpeyv sazber be, “-ne-” dikeve navberê.

Wî dê tu li dibistanê nedîtibûya.
Arjenê dê helbest nenivîsibûna.
Gulanê dê zarok ji dibistanê neanîbûya.

Mêvan dê li derva rûnenishtibûna.
Derîyên giran dê venebûbûna.
Tu dê dîsa nexapîyabûya.

AWAYÊ FERMANÎYÊ

Di *awayê fermanîyê* da karpeyv di forma *pêshedemê* da û ligor *shûnnavên kesanî yê sêyîn* tên karanîn. Lê peyva pêshedemê “dê” nayê karanîn.

nekanî	
erêyîn	neyîn
Bilezîne!	Nelezîne!
Ka bireve!	Ka nereve!
Cê rûnê!	Cê rûnenê!
Guh bide min!	Guh nede min!
Dengê xu bilind bike!	Dengê xu bilind neke!
Were!	Neyê!
Bixebite!	Nexebite!
De biche razê!	De neche ranezê!
Êvarê zû rêkeve!	Êvarê zû rênekeve!

pirranî	
erêyîn	neyîn
Bilezînin!	Nelezînin!
Ka birevin!	Ka nerevin!
Cê rûnên!	Cê rûnenên!
Guh bidin min!	Guh nedîn min!
Dengê xu bilind bikin!	Dengê xu bilind nekin!
Werin!	Neyên!
Bixebitin!	Nexebitin!
De bichin razên!	De nechîn ranezên!
Êvarê zû rêkevin!	Êvarê zû rênekevin!

AWAYÊ PÊWISTÎYÊ

Pêshedem:

Divê em rêkevin!
Divê Kurd li mafên xu xadî derkevin.
Divê em zarokên xu bash perwerde bikin.
Divê tu li vir bimînî!
Divê em ji xu haydar bin!
Divê tu berî xarinê destên xu bisho!
Divê mirov xadî tolerans be.
Divê em, jibo azadîya gel û welatê xu, shev û roj
bixebitin.

Pêshedema chîrokî:

Divîya ew jî bihatana.
Divîya em nechûna.
Divîya we Delal tenê neshanda.
Divîya her kes li vir bicivîya.
Divîya hûn bichûna.
Divîya te ji wan ra têlefon bikira.
Nedivîya hûn bihatana.
Nedivîya ew bichûna.

Pêshedema dûr:

Divê ew jî hatibin.
Divê tu chûbî.
Divê we Delal shandibe.
Divê her kes li vir civîyabe.
Divê hûn hatibin.
Divê te ji wan ra têlefon kiribe.

Pêshedema dûr a chîrokî:

Divîya ew jî hatibûna.
Divîya em chûbûna.
Divîya we Delal tenê neshandibûya.
Divîya her kes li vir civîyabûya.
Divîya ew niha gîhîstibûna Amedê.
Divîya te ji wan ra têlefon kiribûya.

AWAYÊ DAXAZÎYÊ

Pêshedem:

Bila kes ji vir dûrnekeve!
Bila ew jî bên.
Bila kes ji kesî nexeyîde.
Bila zarok têra xu bilîzin.
Bila Gernas xarinê chêke, Dilba jî fereyan bisho.
Bila pirtûk li ser maseyê bimînin.

Pêshedema chîrokî:

Bila zarok jî bihatana.
Bila Lorîn nechûya.
Bila ew li vir bimana.
Bila wî ew name nenivîsîya.
Bila zarok têra xu bilîstana.
Bila her kesî karê xu bikira.

Pêshedema dûr:

Bila zarok jî hatîbin.
Bila Lorîn nechûbe.
Bila ew li vir mabin.
Bila wî ew name nivîsîbe.
Bila zarok têra xu lîstîbin.
Bila her kesî karê xu kiribe.

Pêshedema dûr a chîrokî:

Bila zarok jî hatibûna.
Bila Lorîn nechûbûya.
Bila ew li vir mabûna.
Bila wî ew name nenivîsîbûya.
Bila zarok têra xu lîstibûna.
Bila her kesî karê xu kiribûya.

AWAYÊ XAZÎYÊ

Pêshedem:

Xazî em jî bichin.
Xazî zarok di Newrozê da li vir bin.
Xazî chêleka me cêwî bizê.
Xazî tu bi me ra bê.
Xazî ew li wir nemînin.
Xazî Gulê îshev venegere.

Pêshedema chîrokî:

Xazî me berî rêketinê tishtek bixara.
Xazî em jî bichûna.
Xazî me zarok jî bianîna.
Xazî min sakoyê xu hilda ba xu.
Xazî min gotina kalo bikira.
Xazî hûn zûtir rêketana.
Xazî ez li wir nebûma.

Pêshedema dûr:

Xazî wan berî rêketinê tishtek xaribin.
Xazî ew jî chûbin.
Xazî wê zarok jî anîbin.
Xazî wî sakoyê xu hildabe ba xu.
Xazî zarokan gotina kalo kiribin.
Xazî kechik zûtir rêketibin.
Xazî kes li wir nemabe.

Pêshedema dûr a chîrokî:

Xazî wan berî rêketinê tishtek xaribûna.
Xazî ew jî chûbûna.
Xazî wê zarok jî anîbûna.
Xazî wî sakoyê xu hildabûya ba xu.
Xazî zarokan gotina kalo kiribûna.
Xazî kechik zûtir rêketibûna.
Xazî kes li wir nemabûya.

FORMA PASÎF

Tevokên bi *karpeyvên derbasok*, bi karanîna karpeyva “hatin”ê, dikevin rewsha pasîf.

Di rewsha pasîf da, di karpeyvên din da guherînek pêknayê; ew tim înfînîf tên karanîn.

Karpeyva “hatin”ê ligor subjektê ditewe û di hemû deman da dikare bê karanîn.

Hin mînak:

aktîf

chêkirin
chêrandin
gerandin
kirin
kushtin
nivîsîn
shandin
xandin
xarin

pasîf

hatin chêkirin
hatin chêrandin
hatin gerandin
hatin kirin
hatin kushtin
hatin nivîsîn
hatin shandin
hatin xandin
hatin xarin

aktîf

Dîlan xarinê chêdike.
Terorîstan dîsa chend mirov kushtin.
Berxvan berxan dichêrîne.
Divê hûn vê pirsgirêkê chareser bikin.
Kejê chîrokek xashik nivîsîye.
Wan ji Amedê kes neshandibûn.
Zarokan dê sêv bixarana.

pasîf

Xarin tê chêkirin.
Xarin ji alîyê Dîlanê va tê chêkirin.

Dîsa chend mirov hatin kushtin.
Dîsa chend mirov ji alîyê terorîstan va hatin kushtin.

Berx tên chêrandin.
Divê ev pirsgirêk bê chareser kirin.
Chîrokek xashik hatîye nivîsîn.
Ji Amadê kes nehatibûn shandin.
Sêv dê bihatana xarin.

NAV

Navên nêrîn

- 1 **Navên taybet ên mêran:**
Azad, Serbest, Kendal, Alan, Baran, Cheko,
Serdar...
- 2 **Navên taybet ên chem û chîyayan**
Firat, Dicle, Aras; Agirî, Mûnzûr, Sîpan, Cûdî,
Zagros...
- 3 **Navên gishtî yên mêran:**
mêr, law, bav, kalik, ap, xal, bira, tî, mîr, zave...
- 4 **Navên gishtî yên lawirên nêr:**
beran, ga, boxe, cange, dîk, nêrî, hesp, shêr...
- 5 **Navên hejmaran:**
yek, du, sê, char, pênc, shesh, heft...
- 6 **Jibil “fatik, kezeb, navik, netik/enî, pishik, pisht, qirik, qûn”, navên konkret ên nejimbarbar:**
ser, rû, dil, ruvî, poz, dev, ziman, zik, lash, post,
gosht, mêjî, hustî...
tov, ce, genim, nok, nîsk, birinc, makarna, rûn,
penîr, mast...
hesin, zêr, zîv, dar, êzing, kaxiz, rîs, pempo, zibil,
bar...
sako, chakêt, shal, dêre, fîstan, derpî, kiras... (ji
her yekî yek li ser mirov heye)
fêkî, hêshînahî/sebze, gêha...

7 Navên nêrîn ên derbingehok:

alî, ash, axur, bajar, bar, bijang, bin, birî, bostan,
can, chav, chem, chîya, dan, deng, derbar, derd,
derî, dest, dew, deyn, diran, dîwar, gelî, gîyan,
guh, gund, gurchik, hestî, hêlik, hish, hundir, kar,
kon, ling, mil, nan, nav, pashnav, pî, ruh, shans,
sînor, shîr, shuxul, temen, welat, xanî, xûy

Navên mêyîn

**1 Jibil navên taybet ên mêran, cheman û
chîyayan, her cûr navên taybet:**

Hêlîn, Rojîn, Xezal, Gulistan, Bahar, Delal,
Zozan, Hêvî...
Amed, Hewlêr, Mahabad, Qamishlo, Berlîn,
Parîs...
Botan, Behdînan, Serhed...
Kurdistan, Almanya, Chîna, Swêd...
Amerîka, Afrîka, Ewropa...
Kurdî, Franskî, Chînkî, Swêdkî, Rûskî...
Air Kurdistan, New York Times, CNN...
roj/tav, hîv, erd/dinê, Mars, Saturnus, Jupîter,
Gelawêj...
chile, reshemî, adar, avrêl, gulan...

2 Navên gishtî yên jinan:

jîn, kechik, dayik, met, xûshk, banû, xanim,
gorim, bûk...

- 3 Navên gishtî yên lawirên mê:**
 chêlek, nogin, mî, bizin, mihîn, mirîshk, dêlik,
 dêlegur, shepal...
- 4 Navên tîpan:**
 a, b, c, ch, d, e, ê, f...
- 5 Ji bil “*alî, bin, bar, can, dan, deng, derbar, derd, deyn, gîyan/ruh, hîsh, hundir, kar, nav, pashnav, sûc, shans, shuxul, temen, xûy*”, navên abstrakt:**
 dem, demok, roj, shev, êvar, sal, havîn, zivistan,
 meh...
 bejn, bîn, ked, xebat, hay, bûyer, kiryar, xew,
 xewn, west, evîn, hesret, êsh, xem...
 awantaj, dezawantaj, kar, zerar...
 kom, dewlet, sazî, grûp, komel...
 tashtê, navroj, shîv...
 hejmar, tîp, peyv, ders, matematîk, ekonomî,
 fîzîk, dîrok, ol, spor, mode...
 nav, navber, pêshî, pashî, dawî, dor, hêl...
 tekst, nivîsar, chîrok, helbest, roman...
 yekanî, pirranî, neyînî
 jêr, jor, kêlek, koshe, chep, rast
 rast, derew, virr
 germ, serma, sî, tîn
 bihûsht, dojah
 tarîtî, rindî, delalî, bedewî, dirêjî, kurtî, xizanî,
 dewlemendî, nexashî, shashî, derewî, xeletî,
 zanetî, nezanî, dîrokî, rizgarî, azadî...
 pêshmergetî, mamostetî, shivantî, doktorî,
 dikandarî, rencberî, dadyarî...

- 6 **Jibil** “*bostan, gelî, chîya, chem, gund, bajar, welat, sînor*”, **navên gishtî yê cografîk:**
ax, rê, newal, zevî, mêrg, desht, daristan, goristan, shikeft, girav, kontînent...
kanî, bîr, ajnegeh, co, kanal, tengav, gol, derya, okyanos...
- 7 **Jibil** “*shîr*” û “*dew*”, **navên tishtên herikbar:**
av, xû, xûn, mazot, bênzîn, cola, fanta, mey, vîskî, votka...
- 8 **Peyva “atmosfer” û her tishtên di nav da:**
atmosfer, hewa, ba, baran, sur, bahoz, zîpik, berf, birûsk...
- 9 **Jibil** “*ash, axur, derî, dîwar, kon, xanî; bijang, birî, chav, chichik, dest, diran, guh, gurchik, hestî, ling, mil, pî; nan*”, **navên konkret ên jimarbar:**
sêv, mûz, zebesh, gindor, hejîr, bîyok, hinar, xox...
kunder, tomatês, kartol, pîvaz, bacan, tirp...
gul, shîlan, beybûn, berfîn, binefsh...
dibistan, mal, apartman, mizgeft, dêr, bank, dikan, kargeh, fabrîk...
otomobîl, trê, balafir, bot, bîsiklêt, otobus...
mase, têlevîzîyon, komputer, rûnishtok, paldank, lamp...
kêr, tas, sehen, berosh, chaydank, avdank...
pirtûk, rojname, pênivîs, gotwar...
gustîl, guhar, bazin, demok...
chog, enîshk, lêv, tilî, pêchî; sol, lepik, gore planet, sitêr galaksî

10 Karanîna karpeyvvan wek nav:

firrîna balafiran, hatina we, firotina otomobîlan,
gotina sitranan...

Ev karpeyvên jêrîn, dema wek nav tên karanîn, bi
vî awayî tên karanîn:

bûn – bûyîn; chûn – chûyîn; dan – dayîn; man –
mayîn; zan – zayîn

li vir bûyîna we, dayîna dersên Kurdî,
chûyîna me...

11 Navên mêyîn ên derbingehok:

fatik, kezeb, navik, netik/enî, pishik, pisht, qirik,
qûn

Jêrenot:

Ev peyvên jêrîn, di rewshên normal da, di forma
yekanîyê da nayên karanîn:

ewr, fere, hîs/hest, kinc, raman, zozan

ewrên resh; fereyên neshûstî; hîsên tevîhev; kincên nû;
ramanên zelal; zozanên Serhedê

Nav ne di hevbendîyê da

Nav, di *nûdem* û *pêshedemê* da wek *subjekt*;
di *mêjedemê* da, jîbo *karpeyvên nederbasok*, dîsa wek
subjekt; di *mêjedemê* da, jîbo *karpeyvên derbasok*, wek
objekta dîrekt, ger ne di hevbendîyê da bin, him nakevin
forma nêrîn û mêyînê, him jî nakevin forma pirranîyê.
Yekanî an pirranîya navan jî alîyê karpeyvan va tê dîyar
kirin.

Di hemû rewshên din da:
Navên mêyîn pêveka “-(y)ê” digirin.
Navên nêrîn pêveka “-(y)î” digirin.

Di Kurdîya îroyîn da, navên nêrîn tenê di rewshên jêrîn
da *pêveka nêrîn* digirin:
- dema tev *shûnnavên nîshankî* “vî, wî” bên karanîn
- dema tev *pirspeyvên* “chi, kîjan” bên karanîn
- dema di rewsha *yekanîya nenas* “(y)ek” da bên karanîn

Navên nêrîn, di rewshên din da, pêvêka nêrîn nagirin.

Hin mînak:

Kurdîya kevn : Ez *lawikî/lêwik* dibim dibistanê.
Kurdîya îroyîn: Ez *lawik* dibim dibistanê.

Kurdîya kevn : Em dichin *bajêr*. Em dichin *gund*_.
Kurdîya îroyîn: Em dichin *bajar*. Em dichin *gund*.

Kurdîya kevn : Kî *dizî* nas dike?
Kurdîya îroyîn: Kî *diz* nas dike?

Kurdîya kevn : *Dêrî/derîyî* bigire!
Kurdîya îroyîn: *Derî* bigire!

Kurdîya kevn:

êsha *dilî*
dengê *dîkî*
Chîyayê *Agirî* _
Chemê *Firat* _
lawê *Azêd/Azadî*

Kurdîya îroyîn:

êsha *dîl*
dengê *dîk*
Chîyayê *Agirî*
Chemê *Firat*
lawê *Azad*

Pêveka pirranîyê jibo her du navan jî “-yan” e.

navên nêrîn		
peyv	pêveka yekanîyê: - (y)î	pêveka pirranîyê: -(y)an
lawik	lawik vî/wî lawikî	lawikan van/wan lawikan
lawikek	lawikekî	
shal	shal vî/wî shalî	shalan van/wan shalan
shalek	shalekî	
beran	beran	beranan
beranek	beranekî	
dîk	dîk	dîkan
dîkek	dîkekî	
xanî	xanî	xanîyan
xanîyek	xanîyekî	

navên mêyîn		
peyv	pêveka yekanîyê: - (y)ê	pêveka pirranîyê: -(y)an
kechik	kechikê vê/wê kechikê	kechikan van/wan kechikan
kechikek	kechikekê	
pirtûk	pirtûkê vê/wê pirtûkê	pirtûkan van/wan pirtûkan
pirtûkek	pirtûkekê	
mî	mîyê	mîyan
mîyek	mîyekê	
mirîshk	mirîshkê	mirîshkan
mirîshkek	mirîshkekê	
mal	malê	malan
malek	malekê	

<u>nêrîn</u> pêveka yekanîyê: -(y)î pêveka pirranîyê: -(y)an	<u>mêyîn</u> pêveka yekanîyê: -(y)ê pêveka pirranîyê: -(y)an
Serdar dixaze vî <u>xanîvî</u> ji xu ra bikirre.	Rojîn dixaze vê <u>otomobîlê</u> ji xu ra bikirre.
Serdar dixaze <u>xanîyekî</u> ji xu ra bikirre.	Rojîn dixaze <u>otomobîlekê</u> ji xu ra bikirre.
<u>Serdar</u> ev xanî ji xu ra kirrî.	<u>Rojînê</u> ev otomobîl ji xu ra kirrî.
Wî <u>Serdarî</u> ev xanî ji xu ra kirrî.	Wê <u>Rojînê</u> ev otomobîl ji xu ra kirrî.
<u>Serdar</u> xanîyek ji xu ra kirrî.	<u>Rojînê</u> otomobîlek ji xu ra kirrî.
Alan wî <u>lawikî</u> nas dike. Alan <u>lawik</u> nas dike.	Shîlan wê <u>kechikê</u> nas dike. Shîlan <u>kechikê</u> nas dike.
<u>Alan</u> ew lawik nas dîkir.	<u>Shîlanê</u> ew kechik nas dîkir.
Ez <u>lawikan</u> dibim <u>gund</u> .	Ez <u>kechikan</u> dibim <u>dibistanê</u> .
Ez <u>Baran û Sîyabend</u> dibim <u>gund</u> .	Ez <u>Xezal û Evînê</u> dibim <u>dibistanê</u> .
<u>Lawik</u> kostum li xu kiribû.	<u>Kechikê</u> fîstan li xu kiribû.

Alan <u>derî</u> vedike.	Zozan <u>pirtûk</u> dixûne. (pirtûk, ne tishtek din)
Alan <u>derî</u> vedike.	Zozan <u>pirtûkê</u> dixûne. (pirtûka ku tu jî pê dizanî)
Alan <u>derîyekî</u> vedike.	Zozan <u>pirtûkekê</u> dixûne.
Alan <u>derîyan</u> vedike.	Zozan <u>pirtûkan</u> dixûne.
<u>Alan</u> derî vekir.	<u>Zozanê</u> pirtûk xand.
<u>Alan</u> derî vekirin.	<u>Zozanê</u> pirtûk xandin.
Kîjan <u>Alanî</u> derî vekirin?	Kîjan <u>Zozanê</u> pirtûk xandin?
Wî <u>Alanî</u> ew derî hemû vekirin.	Wê <u>Zozanê</u> ew pirtûk hemû xandin.
Cheko <u>shal</u> li xu dike.	Dilba <u>helbest</u> dinivîse. (helbest, ne tishtek din)
Cheko <u>shal</u> li xu dike.	Dilba <u>helbestê</u> dinivîse. (helbesta ku tu jî pê dizanî)
<u>Cheko</u> shal li xu kir.	<u>Dilbayê</u> helbest nivîsî.
Mase li ber <u>dîwar</u> e.	Pirtûk li ser <u>maseyê</u> ye.
Mase li ber kîjan <u>dîwarî</u> ye?	Pirtûk li ser kîjan <u>maseyê</u> ye?

Di rewshên jêrîn da nav bê pêvek in:

subjekt ne di hevbendîyê da: nûdem û pêshedem	
nêrîn	mêyîn
<u>Lawik</u> diche dibistanê.	<u>Kechik</u> diche dibistanê.
<u>Lawik</u> dê biche dibistanê.	<u>Kechik</u> dê biche dibistanê.
<u>Lawik</u> dichin dibistanê.	<u>Kechik</u> dichin dibistanê.
<u>Soresh</u> derî hêdî hêdî vedike.	<u>Zelal</u> derî hêdî hêdî vedike.
<u>Cheko</u> xarinê chêdike.	<u>Lorîn</u> xarinê chêdike.
<u>Cheko û Serdar</u> xarinê chêdikin.	<u>Lorîn û Rojîn</u> xarinê chêdikin.
<u>Cheko û Serdar</u> dê xarinê chêkin.	<u>Lorîn û Rojîn</u> dê xarinê chêkin.
<u>Shal</u> li ser maseyê ye.	<u>Pirtûk</u> li ser maseyê ye.
<u>Shal</u> li ser maseyê ne.	<u>Pirtûk</u> li ser maseyê ne.

subjekt bi karpeyvên nederbasok û ne di hevbendîyê da: mêjedem	
nêrîn	mêyîn
<u>Lawik</u> dichû dibistanê.	<u>Kechik</u> dichû dibistanê.
<u>Lawik</u> dichûn dibistanê.	<u>Kechik</u> dichûn dibistanê.
<u>Lawik</u> chûn dibistanê.	<u>Kechik</u> chûn dibistanê.
<u>Lawik</u> chûbûn dibistanê.	<u>Kechik</u> chûbûn dibistanê.
<u>Shal</u> li ser maseyê bû.	<u>Pirtûk</u> li ser maseyê bû.
<u>Shal</u> li ser maseyê bûn.	<u>Pirtûk</u> li ser maseyê bûn.
<u>Serbest</u> do ji Amedê hat.	<u>Lorîn</u> do ji Amedê hat.
<u>Serbest</u> dê îro ji Amedê bihata.	<u>Lorîn</u> dê îro ji Amedê bihata.

objekta dîrekt ne di hevbendîyê da: mêjedem	
Wan ev <u>xanî</u> ji xu ra kirrî.	Wan ev <u>otomobîl</u> ji xu ra kirrî.
Min ew <u>lawik</u> nas dikir.	Min ew <u>kechik</u> nas dikir.
Min ew <u>lawik</u> nas dikirin.	Min ew <u>kechik</u> nas dikirin.
Min <u>lawik</u> bir dibistanê.	Min <u>kechik</u> bir dibistanê.
Min <u>Baran û Sîyabend</u> birin dibistanê.	Min <u>Xezal û Evîn</u> birin dibistanê.
Zozanê <u>shal</u> li xu kiribû.	Zozanê <u>sêv</u> xaribû.
Nûjînê ew <u>derî</u> vekiribû.	Nûjînê ew <u>pirtûk</u> di rojekê da xandibû.
Nûjînê ew <u>derî</u> vekiribûn.	Nûjînê ew <u>pirtûk</u> di rojekê da xandibûn.
Nûjînê dê ew <u>derî</u> vekira.	Nûjînê dê ew <u>pirtûk</u> bixanda.
Nûjînê dê ew <u>derî</u> vekirana.	Nûjînê dê ew <u>pirtûk</u> bixandana.

Nav di rewsha hevbendîyê da

Di rewsha hevbendîyê da, peyva ku dikeve hevbendîyê, pêveka hevbendîyê disitîne û peyva ku pê ra hevbendî hatîye danîn, pêveka awayê normal disitîne.

Di hevbendîyê da pêveka yekanîyê jibo navên nêrîn “-(y)ê”, jibo navên mêyîn “-(y)a” û jibo pirranîya her du navan “-(y)ên” e.

navên nêrîn		
peyv	pêveka yekanîyê: -(y)ê	pêveka pirranîyê: -(y)ên
law	lawê min lawek min	lawên min
bira	birayê min birayek min	birayên min
beran	beranê me beranek me	beranên me
shal	shalê min shalek min	shalên min
dil	dilê min	
zik	zikê min	

navên mêyîn		
peyv	pêveka yekanîyê: -(y)a	pêveka pirranîyê: -(y)ên
kech	kech <u>a</u> min kechek min	kech <u>ên</u> min
xûshk	xûshk <u>a</u> min xûshkek min	xûshk <u>ên</u> min
mî	mîy <u>a</u> me mîyek me	mîy <u>ên</u> me
pirtûk	pirtûk <u>a</u> min pirtûkek min	pirtûk <u>ên</u> min
pishik	pishik <u>a</u> min	
pisht	pisht <u>a</u> min	

<u>nêrîn</u> pêveka yekanîyê: -(y)ê pêveka pirranîyê: -(y)ên	<u>mêyîn</u> pêveka yekanîyê: -(y)a pêveka pirranîyê: -(y)ên
<u>Lawikê me</u> diche dibistanê.	<u>Kechika me</u> diche dibistanê.
<u>Lawikên me</u> dichin dibistanê.	<u>Kechikên me</u> dichin dibistanê.

<u>Lawikên</u> me dichûn dibistanê.	<u>Kechikên</u> me dichûn dibistanê.
<u>Shalê</u> te li ser maseyê ye.	<u>Pirtûka</u> te li ser maseyê ye.
<u>Shalê</u> te li ser maseyê bû.	<u>Pirtûka</u> te li ser maseyê bû.
<u>Shalên</u> te li ser maseyê ne.	<u>Pirtûkên</u> te li ser maseyê ne.
<u>Zikê</u> min pirr diêshe.	<u>Pishta</u> min pirr diêshe.
<u>Zikê</u> min pirr êshîyabû.	<u>Pishta</u> min pirr êshîyabû.
<u>Rûyê</u> wê tim wisa bi ken e.	<u>Tilîya</u> wê îcar bê gustîl e.
<u>Rûyê</u> wê tim wisa bi ken bû.	<u>Tilîya</u> wê îcar bê gustîl bû.
Ew dixazin vî <u>xanîyê</u> <u>pichûk</u> ji xu ra bikirrin.	Ew dixazin vê <u>otomobîla nû</u> ji xu ra bikirrin.
Ez <u>lawê</u> xu dibim dibistanê.	Ez <u>kecha</u> xu dibim dibistanê.
Zelal ji <u>birayê</u> xu <u>yê</u> <u>pichûk</u> pirr hez dike.	Zelal ji <u>xûshka</u> xu <u>ya</u> <u>pichûk</u> pirr hez dike.
Zelalê ji <u>birayê</u> xu <u>yê</u> <u>pichûk</u> pirr hez dikir.	Zelalê ji <u>xûshka</u> xu <u>ya</u> <u>pichûk</u> pirr hez dikir.
Zozan <u>shalê</u> <u>resh</u> li xu dike.	Zozan <u>sêva</u> <u>sor</u> dixu.

Zozan <u>shalek resh</u> li xu dike.	Zozan <u>sêvek sor</u> dixu.
Zozanê <u>shalek resh</u> li xu kiribû.	Zozanê <u>sêvek sor</u> xaribû.
Zozan <u>shalên resh</u> li xu dike.	Zozan <u>sêvên sor</u> dixu.
Alan <u>derîyê mezin</u> vedike.	Alan <u>pirtûka hevala xu</u> dixûne.
Alan <u>derîyê mezin</u> vekir.	Alan <u>pirtûka hevala xu</u> xand.
Alan <u>derîyek mezin</u> vedike.	Alan <u>pirtûkek hevala xu</u> dixûne.
Alan <u>derîyên mezin</u> vedike.	Alan <u>pirtûkên hevala xu</u> dixûne.
Em dê vegerin <u>gundê xu</u> .	Em dê vegerin <u>mala xu</u> .
<u>Shalê</u> ku li ser maseyê ye, <u>shalê min</u> e.	<u>Pirtûka</u> ku li ser maseyê ye, <u>pirtûka min</u> e.
<u>Shalê</u> li ser maseyê, <u>shalê min</u> e.	<u>Pirtûka</u> li ser maseyê, <u>pirtûka min</u> e.

Nav di rewsha bang lê kirinê da

Di rewsha bang lê kirinê da, pêveka yekanîyê jibo navên nêrîn “-(y)o”, jibo navên mêyîn “-(y)ê” û jibo pirranîya her du navan “-no” ye.

navên nêrîn			navên mêyîn	
peyv	pêveka yekanîyê: -(y)o	pêveka pirranîyê: -no	peyv	pêveka yekanîyê: -(y)ê
bav	bav <u>o</u>	bav <u>no</u> dayik <u>no</u>	dayik	dayikê
lawik	lawik <u>o</u>	lawik <u>no</u> kechik <u>no</u>	kechik	kechikê
ap	ap <u>o</u>	ap <u>no</u> met <u>no</u>	met	metê
bira	biray <u>o</u>	biran <u>o</u> xûshk <u>no</u>	xûshk	xûshkê
kal	kal <u>o</u>	kal <u>no</u> dapîr <u>no</u>	dapîr	dapîrê
xort	xort <u>o</u>	xort <u>no</u> delal <u>no</u>	delal	delalê
dil	dil <u>o</u>	dil <u>no</u> bedew <u>no</u>	bedew	bedewê

Kurd	Kur <u>d</u> o	Kur <u>dno</u> Kur <u>dno</u>	Kurd	Kur <u>dê</u>
welat	welato	welat <u>no</u> mal <u>no</u>	mal	malê
serhishk	serhishko	serhishk <u>no</u> serhishk <u>no</u>	serhishk	serhishkê
pozbilind	pozbilindo	pozbilind <u>no</u> pozbilind <u>no</u>	pozbilind	pozbilindê
Serdar	Serdar <u>o</u>		Zîn	Zînê
Baran	Baran <u>o</u>		Hêvî	Hêvîyê

Xortno, de rabin!
 Dayikê, ez ji te pirr hez dikim!
 Kurdno, dem dema me ye!
 Welato, axa bav û kalan o. (“o” li vir “Welato” ye)
 Dilo rebeno dilo.
 Delalê, evîndara min ê. (“ê” li vir “Delalê” ye)
 Serdaro, de were lo! (“lo” li vir “Serdaro” ye)
 Zînê, de were lê! (“lê” li vir “Zînê” ye)
 Kechê bedewê, bela serê xortan ê. (“ê” li vir “Kechê” ye)
 Apo, bavê min gazî te dike.
 Keko, bavo li ku ye?
 Metê, ez birchî me.
 Kechikno, de rabin govendê!

Navên bêalî

Salixnav dema jibo mirovan wek *nav* bên karanîn, û *navên gishtî* yên ku him jibo mêran û him jibo jinan tên karanîn, *bêalî* ne, wek:

bajarî, bedew, belengaz, birazî, ciwan, cînar, dadmend, dadyar, delal, derewchîn, dijmin, dikandar, dirêj, diz, doktor, dost, evîndar, garson, girtî, gundî, heval, karmend, kes, kirêdar, kurt, oldar, mamoste, mêvan, mirov, newêrek, navdar, pêrîshan, pêshmerge, pîlot, pîr, rind, sazband, serhîşk, serok, sosyalîst, terorîst, tirsonek, virrek, wêrek, xadî, xandekar, xandevan, xarzî, zarok...

Navên lawiran ên ku him jibo lawirên nêr û him jibo lawirên mê tên karanîn, navên *bêalî* ne. Lê ger zayenda lawiran neyê zanîn, wê gavê ew nav mênên tên karanîn:

chivîk, fîl, hîrch, kevok, meymûn, mêsh, mishk... berx, canî, cûcîk, chêze, golîk, kar, tûle, xotik...

Navên bêalî him dikarin têkevin forma mênên û him jî dikarin têkevin forma nêrên.

Nêrîn	pirranî	mêyîn
<u>Sosyalîstê</u> me li ku ye?	<u>Sosyalîstên</u> me li ku ne?	<u>Sosyalîsta</u> me li ku ye?
<u>Serhîshkê</u> me li kesî guhdarî nake. <u>Serokê</u> komelê ne li vir e.	<u>Serhîshkên</u> me li kesî guhdarî nakin. <u>Serokên</u> komelê ne li vir in.	<u>Serhîshka</u> me li kesî guhdarî nake. <u>Seroka</u> komelê ne li vir e.
Vî <u>belengazî</u> kîsê xu daye dizîn.	Van <u>belengazan</u> kîsên xu dane dizîn.	Vê <u>belengazê</u> kîsê xu daye dizîn.
Vî <u>dizî</u> kîsê min dizî.	Van <u>dizan</u> kîsê min dizîn.	Vê <u>dizê</u> kîsê min dizî.
Wî <u>terorîstî</u> bombe avêt nav komek rêwîyan.	Wan <u>terorîstan</u> bombe avêtin nav komek rêwîyan.	Wê <u>terorîstê</u> bombe avêt nav komek rêwîyan.
Gazî wî <u>derewchînî</u> bike!	Gazî wan <u>derewchînan</u> bike!	Gazî wê <u>derewchînê</u> bike!
<u>Doktorê</u> we kî ye?	<u>Doktorên</u> we kî ne?	<u>Doktora</u> we kî ye?
Navê <u>mamosteyê</u> me Nêchîrvan e.	Navên <u>mamosteyên</u> me Nêchîrvan û Gulistan in.	Navê <u>mamosteya</u> me Gulistan e.

Navê <u>birazîyê</u> min Alan e.	Navên <u>birazîyên</u> min Alan û Gulan in.	Navê <u>birazîya</u> min Gulan.
<u>Berxê</u> resh.	<u>Berxên</u> resh.	<u>Berxa</u> resh.
<u>Golikê</u> belek.	<u>Golikên</u> belek.	<u>Golika</u> belek.

Karanîna hejmaran

Hejmar peyvên nêrîn in, û bi pêvekên nêrîn tên karanîn.

Wek navan, *hejmar* jî, di *nûdem* û *pêshedemê* da wek *subjekt*, di *mêjedemê* da, jibo *karpeyvên nederbasok*, dîsa wek *subjekt*, di *mêjedemê* da, jibo *karpeyvên derbasok*, wek *objekta dîrekt*, ger ne di hevbendîyê da bin, nakevin forma zayend û pirranîyê.

Du chêlek û deh mîyên wan hene.

Wan pênc mîyên xu firotin.

Demok ji sêyan ra deh hebû. Demok ji 3'yan ra 10 hebû.

Di hemû rewshên din da, ger hejmara dawîn “0” an “1” be, hejmar pêveka yekaniyê digire. Ger hejmara dawîn ne yek ji van be, wê gavê hejmar pêveka pirranîyê digire.

di 2000'î da	di sala 2000'î da
di 2001'î da	di sala 2001'î da
di 2002'yan da	di sala 2002'yan da
di 2003'yan da	di sala 2003'yan da
di 2004'an da	di sala 2004'an da
di 2005'an da	di sala 2005'an da

Di rewsha salix dana demokê da, tenê hejmara “1” pêveka yekaniyê digire, yên din pêveka pirranîyê digirin.

Demok ji yekî deh dibuhure. Demok ji 1'î 10 dibuhure.

Demok ji duyan deh dibuhure. Demok ji 2'yan 10 dibuhure.

Demok ji sêyan deh dibuhure. Demok ji 3'yan 10 dibuhure.

Demok ji dehan deh dibuhure. Demok ji 10'an 10 dibuhure.

Hejmar di hevbendîyê da:

Hejmar di hevbendîyê da tim di forma yekanîyê da tên karanîn.

1'ê gulanê	di 1'ê gulanê da
2'yê gulanê	di 2'yê gulanê da
3'yê gulanê	di 3'yê gulanê da
10'ê gulanê	di 10'ê gulanê da
25'ê gulanê	di 25'ê gulanê da
30'yê gulanê	di 30'yê gulanê da

yekê min
duyê min
dehê min
sedê min
hezarê min

SALIXNAV

Peyvên ku salixê *navan* didin, *salixnav* in. *Salixnav* nakevin forma zayend û pirranîyê.

Salixnav xu nakevin hevbendîyê, lê bi wan ra hevbendî dikare bê danîn.

Di rewsha hevbendîyê da, kîjan peyv bi peyva salixnav ra ketibe hevbendîyê, salixnav li pey wê peyvê cî digire û peyvên din nikarin têkevin navberê.

Di rewsha hevberîyê da, pêveka *pêlika yekîn* “-tir” û pêveka *pêlika bêhempa* “-tirîn” e. Jibo pêlika bêhempa peyva “herî” jî tê karanîn. Salixnav, dema tev peyva “herî” bê karanîn, pêvek nagire. Peyva “herî” tim li pêsh salixnavê cî digire û peyvek din nikare têkeve navbera wan.

Di *pêlika yekîn* a hevberîyê da, jibo hevber kirinê, peyva “jî” tê karanîn û “ji” li pêsh peyva ku pê ra hevberî tê kirin cî digire.

	pêlikên hevberîyê		
peyva bingeh	pêlika yekîn (-tir)	pêkila bêhempa (-tirîn, herî)	
pîrr	pîrtîr	pîrtîrîn	herî pîrr
kêm	kêmtîr	kêmtîrîn	herî kêm
bedew	bedewtîr	bedewtîrîn	herî bedew
bêd	bêdtîr	bêdtîrîn	herî bêd
gir	girtîr	girtîrîn	herî gir
pîchûk	pîchûktîr	pîchûktîrîn	herî pîchûk
dûr	dûrtîr	dûrtîrîn	herî dûr
nêzîk	nêzîktîr	nêzîktîrîn	herî nêzîk
ciwan	ciwantîr	ciwantîrîn	herî ciwan
pîr	pîrtîr	pîrtîrîn	herî pîr
resh	reshtîr	reshtîrîn	herî resh
sor	sortîr	sortîrîn	herî sor
shîn	shîntîr	shîntîrîn	herî shîn

Mamoste xash dipeyve.

- Li vir salixê “peyvîna” mamoste tê dayîn. Chawa dipeyve? Xash dipeyve.

Tu chima wisa kûr diramî?

- Li vir salixê awayê “ramîna” kesekî tê dayîn. Chawa dirame? Kûr dirame.

Hûn chima wisa dereng hatin?

- Li vir salixê rewsha “hatina” wan tê dayîn.

Bejna Zozanê direj e, bejna Delalê dirêjtir e, bejna Lorînê dirêjtirîn e.

Gulê keçek bedew e, Zînê bedewtir e, Rojîn bedewtirîn
e.
Gol mezin in, derya mezintir in, okyanos mezintirîn in.
Sîyabend ji Beko jîrtir e.
Shervan ji Chekdar dirêjtir e.
Gund ji bajaran pîchûktir in.
Agirî chîyayê bilindtirîn ê Kurdistanê ye. Agirî chîyayê
herî bilind ê Kurdistanê ye.
Kurdî mumkun e zimanê kevntirîn ê dinê be. Kurdî
mumkun e zimanê herî kevn ê dinê be.

hin salixnav

balkêsh	hindîk
bash	hîshk
bêd	hov
bedew	humanîst
belengaz	jîr
ber	kal
baha	kêm
bilind	kin
bîrchî	kîp
ciwan	ko
delal	kok, qelew
demokrat	komunîst
dereng	kûr
dewlemend	kurt
dîjwar	lez
dirêj	mezin
dîn	nerm
durust	nexash
dûr	nezan
erzan	nêzîk
germ	nîzm
gesh	nû
gêj	pak, paqij
gir	pîchûk
giran	pîr
girîng	pîs, qirêj
gurr	pît
har	radîkal
hêja	rashîst
hêsan	rind

ronak	zirav
sar	zû
sist	
sosyalîst	bor, qaweyî
shêlî	gewr
shil	gulî, kinûshk
shîrîn	kesk
sitûr	mor
sivik	narincî
shor	resh
tarî	shîn
tendurust	sipî
teng	sor
tenik	zer
teze	
têr	
tijî	
tî	
tîr	
tirsh	
tirsonek, newêrek	
tûj	
vala	
wêrek	
xas	
xash	
xirab	
xizan	
xurt	
zane	
zelal	
zîha	

hin salixnavên bê pêlik

beredayî	: mirovên beredayî Ew mirovek <u>beradayî</u> ye.
destgirtî	: kechên destgirtî Shîlan <u>destgirtî</u> ye.
girtî	: derîyên girtî Hemû derî <u>girtî</u> bûn.
hezkirî	: mirovên hezkirî Shermîn mirovek gelek <u>hezkirî</u> ye.
kelandî	: ava kelandî Ava <u>kelandî</u> nema.
markirî	: jina markirî Delal jinek <u>markirî</u> ye.
mirî	: mirovên mirî
peritî	: kincên peritî
qetîyayî	: goreyên qetîyayî
shekirî	: porên shekirî
shewitî	: gundên shewitî
shikestî	: dilên shikestî
shîrgermî	: ava shîrgermî
terkkirî	: malên terkkirî
vekirî	: pencereyên vekirî
vemirî	: chirayên vemirî
weshîyayî	: porên weshîyayî
berê	: salên berê
pashê	: tishtên pashê

bîstî	: di salên bîstî da di salên 20'î da
heshtêyî	: di salên heshtêyî da di salên 80'yî da
nodî	: di salên nodî da di salên 90'î da
darîn	: shimikên darîn Shimikên min ên <u>darîn</u> li ku ne?
derewîn	: gotinên derewîn Hin welat xadî dîrokên <u>derewîn</u> in.
deshtîn	: erdên deshtîn Erdên <u>deshtîn</u> jibo chandinîyê gelek bash in.
ewrîn	: asmanên ewrîn
hesinîn	: derîyên hesinîn
kevirîn	: chîyayên kevirîn
mêyîn	: peyvên mêyîn
nermîn	: tishtên nermîn
nêrîn	: peyvên nêrîn
pashîn	: cara pashîn
pêshîn	: rêya pêshîn
rastîn	: bûyerên rastîn
rojîn	: karên rojîn
shevîn	: bûyerên shevîn
zêrîn	: gustîlên zêrîn
zîvîn	: guharên zîvîn
yekîn	: cara yekîn
duyîn	: hejmara duyîn
sêyîn	: rûpela sêyîn

BENDIK

Di Kurdî da du cûr bendik hene: **pêshbendik** û **cotbendik**.

Pêshbendik li pêsh peyv an peyvên ku bi xu va bend dikin, cî digirin.

Cotbendik ji du peyvan pêktên. Ew, peyv an peyvên ku bi xu va bend dikin, hildidin nav xu.

Bendik nakevin forma zayend û pirranîyê.

Pêshbendik:

jê = ji...	: Delal <u>ji</u> xandinê pirr hez dike. : Tu tishtek <u>ji</u> destê wî nayê. : Kechik <u>ji</u> dibistanê tê.
lê = li...	: Zarok <u>li</u> lîstikgehê dilîzin. : Dapîr û bavpîrê min <u>li</u> gund dijîn. : Îro kes ne <u>li</u> mal e.
pê = bi...	: Em <u>bi</u> chi herin? <u>Bi</u> trêne an <u>bi</u> otobusê? : Ev gotina te <u>bi</u> min xash hat. : Rêzimana Kurdî <u>bi</u> min gelek zelal e.
bê	: <u>Bê</u> xebat serketin ne mumkun e.
berbi	: Ez <u>berbi</u> malê dichim.
digel	: Em <u>digel</u> hevalên xu hatin.
dij	: Cûwî û Erebi <u>dij</u> hev in.
jîber	: <u>Jîber</u> hin sedeman ez nikarim bêm.
jîbil	: <u>Jîbil</u> dayika xu tu kesek xu tune.
jîbo	: Fêkî xarin <u>jîbo</u> tendurustîyê gelek bash e.

ligor : Ligor min ev rê shash e.
heta : Hûn heta ku chûn?
tev : Te lawik tev kê shand dibistanê?

ba	bin	cem	hevber	jêr	jor
li ba	li bin	li cem	li hevber	li jêr	li jor
ji ba	ji bin	ji cem	ji hevber	ji jêr	ji jor

pash	pey	pêsh	pisht	rex	ser
li pash	li pey	li pêş	li pisht	li rex	li ser
ji pash	ji pey	ji pêş	ji pisht	ji rex	ji ser

Kejê guldank danî ser têlevîzîyonê.
Kejê guldank danî rex têlevîzîyonê.

Guldank li ser têlevîzîyonê ye.
Guldank li rex têlevîzîyonê ye.

Kejê guldank ji ser têlevîzîyonê hilda.
Kêjê guldank ji rex têlevîzîyonê hilda.

Kechik ketîye pey pisîkê.
Kechik li pey pisîkê ye.
Kechik ji pey pisîkê tê.

Cotbendik:

Ev bendik, peyv an peyvên ku bi xu va bend dikin,
hildidin nav xu.

jê da = ji ... da	Ji adarê vir <u>da</u> hewa tim germ e. Kendal ta <u>ji</u> serî <u>da</u> ne bi wan ra bû. Me <u>ji</u> zû <u>da</u> dest bi karê xu kirîye.
jê ra = ji ... ra	Ji her kesî <u>ra</u> silavên min bibêje. Em <u>ji</u> zarokan <u>ra</u> chi bikirrin? Wî û jina xu <u>ji</u> hev <u>ra</u> tishtên negotî gotin. Jîyan û Bengîn <u>ji</u> mêvanan <u>ra</u> shîvê chêdikin.
jê va = ji ... va	Hûn <u>ji</u> kengê <u>va</u> li vir cî bûne? Me ew <u>ji</u> zû <u>va</u> ye nedîtine. <u>Ji</u> alîyê me <u>va</u> pîrsgirêk tunin. <u>Ji</u> dûr <u>va</u> her tisht bash nayê zanîn.
pê da = bi ... da	Tu <u>bi</u> ku <u>da</u> dichî? (Tu dichî ku?) Kurdistana Bashûr di her warî da <u>bi</u> pêsh <u>da</u> diche. Ew mirov <u>bi</u> vir <u>da</u> tên.
pê ra = bi ... ra	Hûn <u>bi</u> kê <u>ra</u> hatin? Em <u>bi</u> hevalên xu <u>ra</u> hatin. Ez <u>bi</u> kecha xu <u>ra</u> dilîzim. Mamoste <u>bi</u> zarokan <u>ra</u> dipeyve.

pê va = bi ... va	Hûn <u>bi</u> chi <u>va</u> hatin? Em <u>bi</u> trêne <u>va</u> hatin. Kechik <u>bi</u> lîstokên xu <u>va</u> dilîze. Kalo <u>bi</u> dûrbînê <u>va</u> li chîyayê Agirî dinêre.
tê da = di ... da	Barzanîyê nemir <u>di</u> sala 1979'an <u>da</u> chû ser dîlovanîya xu. Bimînin <u>di</u> xashîyê <u>da</u>! <u>Di</u> gundê me <u>da</u> 50 xanî hene. <u>Di</u> warê tendurustîyê <u>da</u> gelek pêshketin chêbûn.
tê ra = di ... ra	Em dê <u>di</u> vê rêyê <u>ra</u> herin. Dapîra min nikare tayê <u>di</u> derzîyê <u>ra</u> bike. Bûkê gustîla zave <u>di</u> tilîya xu <u>ra</u> nekir. Zarok <u>di</u> xew <u>ra</u> chûne.
tê va = di ... va	Ew her tishtên xu <u>di</u> bin <u>va</u> chareser dîkin. (bê ku haya kesî jê hebe) Ez <u>di</u> ser <u>va</u> nebûm. (Ez têngîhîstîm.) Kemera xu <u>di</u> pishta xu <u>va</u> girêde. Wê kaxizê <u>di</u> wî dîwarî <u>va</u> bizeliqîne.

SHÛNNAV

Di vê babetê da em dê li ser shesh cûr shûnnavan bisekinin.

- shûnnavên kesanî
- shûnnavên xadîtî/dêranî
- shûnnavên nîshankî
- shûnnavên dorkî
- shûnnavên hevbendîyê
- shûnnavên nenas

shûnnavên kesanî

Di Kurdî da du cûr *shûnnavên kesanî* hene.

Cûra yekîn:

Di nûdem û pêshedemê da jibo hemû karpeyvan: *subjekt*.

Di mêjedemê da jibo karpeyvên nederbasok: *subjekt*.

Di mêjedemê da jibo karpeyvên derbasok: *objekta dîrekt*.

	yekanî	pirranî
1	<i>ez</i>	<i>em</i>
2	<i>tu</i>	<i>hûn</i>
3	<i>ew</i>	<i>ew</i>

Ez dichim dibistanê.

Tu dê bichî dibistanê.

Ew chû dibistanê.

Gulanê ez birim dibistanê.

Em dichin dibistanê.

Hûn dê bichin dibistanê.

Ew chûn dibistanê.

Gulanê em birin dibistanê.

Cûra duyîn:

Di nûdem û pêshedemê da: *objekta direkt*.

Di mêjedemê da jibo karpeyvên derbasok: *subjekt*.

	yekanî	pirranî
1	<i>min</i>	<i>me</i>
2	<i>te</i>	<i>we</i>
3	<i>wî</i> (jibo mêran) <i>wê</i> (jibo jinan)	wan

Gulan min/te/wî/wê/me/we/wan dibe dibistanê.

Gulan û Dilan min/te/wî/wê/me/we/wan dibin dibistanê.

Min/te/wî/wê/me/we/wan Gulan bir dibistanê.

Min/te/wî/wê/me/we/wan Gulan û Dîlan birin dibistanê.

shûnnavên xadîtî/dêranî

*Shûnnavên xadîtî û shûnnavên kesanî yê cûra duyîn
wek hev in. Lê fonksiyon û karanîna wan cuda ye.
Shûnnavên xadîtî tim di hevbendîyê da tên karanîn.*

	yekanî	pirranî
1	<i>min</i>	<i>me</i>
2	<i>te</i>	<i>we</i>
3	<i>wî (jibo mêran) wê (jibo jinan)</i>	<i>wan</i>

kecha min
sakoyê te
bavê wî
sitranên wê
gundê me
zarokên we
welatê wan

shûnnavên nîshankî

Bi shûnnavên nîshankî mirov tishtekî an kesekî nîshan dide.

Shûnnavên nîshankî jî, wek shûnnavên kesanî, du cûr in.

Cûra yekîn:

Di nûdem û pêshedemê da wek subjekt.

Di mêjedemê da wek objekta dîrekt.

Di cûra yekîn da forma zayend û pirranîyê tune. Yekanî an pirranîya wan karpeyv dîyar dike.

	yekanî	pirranî
nêzîk	<i>ev</i>	<i>ev</i>
dûr	<i>ew</i>	<i>ew</i>

Ew kechik ji Amedê ye.

Ew kechik ji Amedê ne.

Ew lawik ji Amedê ye.

Ew lawik ji Amedê ne.

Min ew kechik berê jî nas dikir.

Min ew kechik berê jî nas dikirin.

Min ew lawik berê jî nas dikir.

Min ew lawik berê jî nas dikirin.

Cûra duyîn:

Di nûdem û pêshedemê da: *objekta direkt*.

Di mêjedemê da, jibo karpeyvên derbasok: *subjekt*.

Di hemû deman da: *cî*.

	yekanî		pirranî
	nêrîn	mêyîn	
nêzîk	vî	vê	van
dûr	wî	wê	wan

Ez wê kechikê nas dikim.

Ez wan kechikan nas dikim.

Ez wî lawikî nas dikim.

Ez wan lawikan nas dikim.

Wê kechikê ez nas kirim.

Wan kechikan ez nas kirim.

Wî lawikî ez nas kirim.

Wan lawikan ez nas kirim.

Em dê îshev li vê malê bimînin.

Em dê îshev li wan malan bimînin.

Zarokên Xezalê li wê dibistanê dixûnin.

Zarokên Xezalê li wan dibistanan dixûnin.

shûnnavên dorkî

Di Kurdî da du shûnnavên dorkî hene: *xu* û *hev*
Shûnnavên dorkî, formên taybet ên *shûnnavên kesanî* ne,
lê tu car wek subjekt nayên karanîn.

Xu:

ez xu	tu xu	ew xu
min xu	te xu	wî / wê xu

em xu	hûn xu	ew xu
me xu	we xu	wan xu

Ez ji baypîrê xu pirr hez dikim.
Delalê ji xu ra dêreyek sor kirrî.
Ez dê xu ji wan ra têlefona bikim.
Ew xu hatin ba me.
Wan her tishtên xu firotin.
Pirtûk xu gelek balkêş bû, lê naveroka wê vala bû.

Hev:

Hev jibo yek kesî an yek tishtî nayê karanîn. Wek
gîrêdanek di navbera zêdetir kesan an tishtan da tê
karanîn.

Derya û Serbest evîndarên hev in. Ew ji hev gelek hez
dikin. Ew hev ji zû da nas dikin.
Kechik û lawik ji hev xeydîbûn, lê cardin li hev hatin.
Zarok bi hev ra dilîzin.
Ew her du bira bi tu awayî nashibin hev.
Ew bajar gelek dûrî hev in.
Gundên wan nêzîkî hev in.

shûnnavên hevbendîyê

Shûnnavên hevbendîyê parcheyên tevokê yên berî xu nîshan didin û bi yên pey xu va girêdidin.

Shûnnavên hevbendîyê ev in:

jîbo navên nêrîn	: (y)ê
jîbo navên mêyîn	: (y)a
jîbo pirranîyê	: (y)ên

Partîya Demokrat a Kurdistanê.

Peyva “partî” mêyîn e.

Peyva “demokrat” li vir *salixnav* e, nikare pêvek bigire.

“a” li vir *Partîya Demokrat* û *Kurdistanê* bi hev va girêdide.

Kecha wî ya mezin bûye mamosteya zimanê Kurdî.

Peyva “kech” mêyîn e.

“wî” *shûnnavê xadîtî* ye, nikare pevek bigire.

“ya” li vir *Kecha wî* û *mezin* bi hev va girêdide)

Kurdî yek ji zimanên kevintirîn ê dinê ye.

Lawê wan ê pichûk diche zanîngehê.

Te gotwarên xu yên kevn chi kirin?

Shalê te yê resh li ku ye?

Kincên xu yên qirêj biavêje shûstokê.

Pirtûka li ser maseyê ya min e.

Ev otomobîla sor a meta Gulanê ye.

Ew shalê resh ê min e. Ew shalê resh ne yê min e.

Di nav wan lawikan da yê herî jîr Cheko ye.
Ew helbestên xashik ên Cîgerxûn in.

shûnnavên nenas

Nav, di rewsha nenas da, pirranî tev *shûnnavên nenas* tên karanîn.

hemû	<u>Hemû</u> <u>mirov</u> li wir kom bûbûn.
her	Îro <u>her</u> <u>kes</u> li mal e. Îro <u>her</u> <u>der</u> vekirî ye.
hin	Shîlanê jibo dîlanê ji xu ra <u>hin</u> <u>tisht</u> kirrîn.
qet	<u>Qet</u> <u>tishtek</u> wî nemabû.
tu	<u>Tu</u> <u>kesek</u> wê tune.

PIRSPEYV

Jibo ku karanîna pirspeyvan û têkilîyên wan bi peyvên din ra bash zelal bibe, ew li jêr bi du awayan cî digirin. Lê zêdetir awa jî mumkun in. Jibo haydariya berfire, di derbarê tevoksazîyê da, li besha “*tevoksazî*”yê binêrin.

birra Hûn ne birchî ne **birra**?
 Birra hûn ne birchî ne?

 Ew kechik 20 salî ye **birra**?
 Birra ew kechik 20 salî ye?

 Dapîra Dîlanê mirîye **birra**?
 Birra dapîra Dîlanê mirîye?

chawa/cher/chito

 Tendurustîya dapîra te **chawa** ye?
 Chawa ye tendurustîya dapîra te?

 Ev lîstik **chawa** tê lîstin?
 Chawa tê lîstin ev lîstik?

 Wan **chawa** li hev kirin?
 Chawa li hev kirin wan?

chend Dapîra te **chend** salî ye?
 Chend salî ye dapîra te?

 Ew **chend** xûshk û bira ne?
 Chend xûshk û bira ne ew?

Îro **chendê** gulanê ye?
Chendê gulanê ye îro?
(du fonksîyon: him nav, him pirspeyv)

chi Tu îro **chi** karî dikî?
Chi karî dikî tu îro?

Hûn bi **chi** hatin?
Bi **chi** hatin hûn?

Zarok **chi** dixazin?
Chi dixazin zarok?

chichend, chiqas

Hê **chiqas** rêya me maye?
Chiqas rêya me maye hê?

Em **chiqas** kartol bikirrin?
Chiqas kartol bikirrin em?

Li kolanan **chiqas** zarok dijîn?
Chiqas zarok dijîn li kolanan?

chima Hûn **chima** wisa bêdeng in?
Chima wisa bêdeng in hûn?

Ew **chima** ji hev xeyîdîne?
Chima ji hev xeyîdîne ew?

Gelo trêna **chima** rênakeve?
Chima rênakeve trêna gelo?

gelo	Lawik ji dibistanê hat gelo ?
	Gelo lawik ji dibistanê hat?
	Ew dê serkevin gelo ?
	Gelo ew dê serkevin?
	Em gazî wan jî bikin gelo ?
	Gelo em gazî wan jî bikin?
ka/kanê	Pirtûka min ka ?
	Ka pirtûka min?
	Dîyarîya Zozanê ka ?
	Ka dîyarîya Zozanê?
	Ka hûn dê do bihatana?
kanên	Pirtûkên min kanên ?
	Kanên pirtûkên min?
	Dîyarîyên Zozanê kanên ?
	Kanên dîyarîyên Zozanê?
	Zarok kanên ?
	Kanên zarok?

kengê	Bizava Agirîyê kengê bû? Kengê bû bizava Agirîyê? Mêvanên we kengê hatin? Kengê hatin mêvanên we? Hûn ji kengê va li vir cî bûne? Ji kengê va hûn li vir cî bûne?
kîjan	Otomobîla te kîjan e? Kîjan e otomobîla te? Hûn kîjan metodê kartînin? Kîjan metodê kartînin hûn? Tu kîjanî/kîjanê/kîjanan dixazî? (du fonksîyon: him nav, him pirspeyv) Kîjanî/kîjanê/kîjanan dixazî tu?
ku	Zarok li ku ne? Li ku ne zarok? Mamosteya we ji ku ye? Ji ku ye mamosteya we? Em îro herin ku? Herin ku em îro?
ma	Ma tu bi min ra nayê? Ma kes vê rewsha wan nabîne? Ma îro shemî ye?

kî:

Di nûdem û pêshedemê da wek subjekt.

Di mêjedemê da, jibo karpeyvên nederbasok, wek subjekt.

Di mêjedemê da, jibo karpeyvên derbasok, wek objekta dîrekt.

Mêvanên we **kî** ne? (subjekt)

Kî ne mêvanên we? (subjekt)

Ew **kî** bûn? (subjekt)

Kî bûn ew? (subjekt)

We ji me **kî** dît? (objekta dîrekt)

kê:

Di nûdem û pêshedemê da wek objekta dîrekt.

Di mêjedemê da, jibo karpeyvên derbasok, wek subjekt.

Em **kê** bi xu ra bibin? (objekta dîrekt)

Kê bi xu ra bibin em? (objekta dîrekt)

Ew **kê** dixazin? (objekta dîrekt)

Kê dixazin ew? (objekta dîrekt)

Kê hûn anîn? (subjekt)

SALIXPEYV

Salixpeyv salixê *karpeyv* û *salixnavan* didin. *Salixpeyvek* dikare salixê *salixpeyvek* din jî bide. *Salixpeyv* nakevin forma zayend û pirranîyê, nakevin hevbendîyê û bi wan ra hevbendî nayê danîn.

hin salixpeyvên deman:

berî, pishtî, niha, tavalê, nû, îshev, îro, do, pêr, pitirpêr, sibê, îsal, par, pêrar, pitirpêrar, demok...

berî	Em <u>berî</u> wan hatin.
do	Ew <u>do</u> hatin.
îro	Tu <u>îro</u> chi karî dikî?
îsal	<u>Îsal</u> berf gelek barîya.
îshev	Divê em <u>îshev</u> rêkevin.
nû	Mêvan <u>nû</u> hatin.
niha	Em <u>niha</u> nikarin bi we ra bên.
pishtî	<u>Pishtî</u> xarinê me chay vexar.
tavalê	Ew <u>tavalê</u> rêketin.
demok	Em di <u>demok</u> 2'yan da ji wir derketin.

Hin ji van *salixpeyv*an xadîyê zêdetir manayan in, jiber vê yekê dikarin di fonksîyonên din da jî bên karanîn.

Hin mînak:

Mêvan <u>nû</u> hatin.	(salixpeyv)
Mêvanên <u>nû</u> hatin.	(salixnav)
<u>Demok</u> chend e?	(salixpeyv)
<u>Demoka</u> min li ku ye?	(nav)

hin salixpeyvên cîyan:

ber, berjêr, berjor, bin, der, derva, hevraz, hundir, jêr, jor,
nav, pash, pêsh, ser, vir, wir...

vir	Ew ne li <u>vir</u> in.
wir	Kes li <u>wir</u> nîne.
berjêr	Ev rê <u>berjêr</u> diche.
jêr, jor	Ji <u>jêr</u> heta <u>jor</u> .
pash	Ew dîsa li <u>pash</u> man.
derva	Em dichin <u>derva</u> .

Hin ji van *salixpeyv*an xadîyê zêdetir manayan in, jiber
vê yekê dikarin di fonksîyonên din da jî bên karanîn.

Hin mînak:

Ew li <u>pêsh</u> in.	(salixpeyv)
Li <u>pêsh</u> xu binêre!	(bendik)
Ez dichim <u>hundir</u> .	(salixpeyv)
<u>Hundirê</u> malê tevîhev e.	(nav)
Mala wan li <u>jor</u> e.	(salixpeyv)
Mala wan li <u>jora</u> gund e.	(nav)

hin salixpeyvên rewshan:

amade, angorî, bash, belkî, bere bere, cardin, dîsa,
dubare, gav bi gav, gelek, hê, helbet, hema hema, îcar, jî,
jixu, loma, ne, pirr, pirranî, rast, tam, tamam, tenê, tim,
tune, wisa/weha/wer, wekî din, wenda, xadî, xilas, yeko
yeko...

angorî	<u>Angorî</u> berê berf niha kêr dibare.
amade	Fermo, xarin <u>amade</u> ye!
belkî	Ew <u>belkî</u> îro neyên.
bere bere	Ew wê rêya nû <u>bere bere</u> chêdikin û tên.
cardin	<u>Cardin</u> shashîyên weha neke!
dîsa	Te <u>dîsa</u> chi kir?
gav bi gav	Zimanek nû mirov <u>gav bi gav</u> hîn dibe.
hê	Min ew pirtûk <u>hê</u> nexandîye.
helbet	<u>Helbet</u> em dê alîkarîya te bikin!
hema hema	Karê me <u>hema hema</u> xilas dibe.
jî	Zelal <u>jî</u> îcar nehatibû.
jixu	<u>Jixu</u> ew tu car nayê.
loma	Dapîra min nexash bû, <u>loma</u> nikarîbû bihata.
ne	Ew <u>ne</u> sakoyê min e.
pirranî	Ew <u>pirranî</u> li gund dimînin.
rast	<u>Rast</u> here!
tim	Shoresh <u>tim</u> dixebite.
wisa/weha/wer	<u>Wisa</u> nabe! Kechikan chima <u>wisa</u> mirûzê xu kirine?
wekî din	<u>Wekî din</u> ji me ra tishtek navê.

Hin ji van *salixpeyvvan* xadîyê zêdetir manayan in, jiber vê yekê dikarin di fonksîyonên din da jî bên karanîn.

Hin mînak:

Bavê min pirranî li gund e. (salixpeyv)

Bavê min pirranîya rojên xu li gund derbas dike. (nav)

Rast here! (salixpeyv)

Here rastê! (nav)

Kartolên gundîyan îsal pirr kêr in. (salixpeyv)

Kartolên gundîyan îsal pirr in. (salixnav)

Ramanên wan bash zelal nînin. (salixpeyv)

Ew xadî ramanên bash in. (salixnav)

Ew ne xadî zarok in. (salixpeyv)

Xadîyê vê otomobîlê kê ye? (nav)

TEVOKBEND

Tevokbend du tevokan bi hev va bend dikin, bi hev va girêdidin. Ew nakevin forma zayend û pirranîyê.

Hemû tevokbend ligor rêza alfabetîk:

an	Ma hûn ji Amedê ne, <u>an</u> ji Batmanê ne? Ew dê <u>an</u> li vir cî bibin, <u>an</u> vegerin gundê xu. Ma em herin sînemayê, an herin shanogehê?
chend	<u>Chend</u> kes hatibûn, nayê bîra min. Hûn <u>chend</u> rojan bixazin, dikarin bimînin. Kechik <u>chend</u> salî bû, nizanim.
chendi/chichend/chiqas	Hûn <u>chiqas</u> bixazin, dikarin vexun. Em <u>chiqas</u> rê chûn, nayê bîra min. Hejmara ajobaran <u>chiqas</u> zêdetir dibe, trafîk ewchend tevîhevtir dibe.
cher/chawa	Hûn <u>cher</u> bixazin, em dê wisa bikin. Ew <u>cher</u> hatin, em rêketin. Girtî ji girtîgehê <u>chawa</u> revîyan, kes nizane.
chi	<u>Chi</u> ji destê me bê, em dê bikin. Kecha wî <u>chi</u> bixaze, ew 'erê' dibêje. <u>Chi</u> dike, kes nizane.

daku	Derî bigire, <u>daku</u> hundir sar nebe. Zû vegerin, <u>daku</u> em dereng nemînin! Zêde nepeyve, <u>daku</u> kes ji te aciz nebe.
dema (ku)	<u>Dema</u> em hatin, her kes chûbû. <u>Dema</u> bavpîrê min nexash bû, dapîra min tim li cem wî bû. <u>Dema</u> berf bibare, zarok tim li derva ne.
geh	<u>Geh</u> li vir e, <u>geh</u> li wir e. <u>Geh</u> li gund e, <u>geh</u> li bajar e. Zarok <u>geh</u> dilîzin, <u>geh</u> sher dîkin. Ew belangazê bêkes <u>geh</u> têr e, <u>geh</u> birchî ye.
ger	<u>Ger</u> daxazek we hebe, me haydar bikin. <u>Ger</u> hûn birchî ne, ez xarinê chêkim. <u>Ger</u> ew nikarîbin bên, em dê bichin.
heta	<u>Heta</u> zave neyê, bûk ji malê dernakeve. <u>Heta</u> welatê me azad nebe, zulm û zordariya li ser me kêr nabe. <u>Heta</u> berf nehele, kes nikare ji vî gundî derkeve.
him	<u>Him</u> dimeshe, <u>him</u> sitranan dibêje. Pitik <u>him</u> dikene, <u>him</u> digirî <u>Alan</u> him dixebite, him diche zanîngehê.

hingî	<u>Hingî</u> ew hev nas dîkin, tim ba hev in. <u>Hingî</u> dayika wê nexash e, ew gelek xemgîn e. <u>Hingî</u> chûye, kesî jê tishtek nebihîstîye.
jî	Kechik xarinê chêdike, lawik <u>jî</u> fereyan disho. Dayê ne li mal e, bavo <u>jî</u> chûye gund. Ew shal pichûk bû, ev shal <u>jî</u> gir e.
kengê	Xezal <u>kengê</u> bixaze, dikare bê. Shîrîn <u>kengê</u> xarinê chêke, destê xu dishewitîne. Ew kengê <u>chûn</u> , haya me jê nebû.
kîjan	<u>Kîjan</u> rê kurttir be, em di wir ra herin. <u>Kîjan</u> pirtûkê bixazî, dikarî deyn bikî. <u>Kîjan</u> sal bû, nayê bîra min.
ku	Kecha <u>ku</u> li wir dilîze, kecha min e. Jiber <u>ku</u> dayika wê nexash e, ew li mal dimîne. Cara pêshîn <u>ku</u> ew li vir bûn, gelek tevîhevî chêbûbû.
lê	Ew nexash e, <u>lê</u> naxaze biche ba doktor. Ez ne birchî me, <u>lê</u> tî me. Kekê min dê sibê bê, <u>lê</u> zêde namîne.
tenê	Tenê dilê xu xash bike, her tishtê bash bibe. Tenê me ji bîr neke, wekî din daxazek me tune.

û Dapîra min 90 salî ye û hê li ser xu ye.
Wan terka gundê xu kir û cardin
venegerîyan.

BANGPEYV

Sê cûr bangpeyv hene:

Bangpeyvên normal:

Erê!	Erê, wek gotina wî ye.
Belê!	Belê, rast e.
Na!	Na, ew îro nayên.
Silav!	Silav, mamoste!
Beyanîbash!	Beyanîbash, bavo!
Rojbash!	Rojbash, hevalno!
Êvarbash!	Êvarbash, zarokno!
Shevbash!	Shevbash, dayê!
Demxash!	Demxash, cînarno!
Hawar!	Hawar, gundîno!
Fermo!	Fermo, xarin amade ye!
gelî	Gelî hevalno!
lê, lê lê	Lê/lê lê, tu min nabihîsî? Lê lê?
lo, lo lo	Lo/lo lo, tu min nabihîsî? Lo lo?
cê/ca	<u>Cê</u> were! <u>Cê</u> derî bigire!
ka	<u>Ka</u> em binêrin kî hatine.

Bangpeyvên hîsî:

Err!	Err, ew chi deng bû wisa!
Hey wax!	Hey wax, ev dê jî bihata serê wan!
Of!	Of, qet daxazên te jî xilas nabin!
Tew!	Tew, heta ew bên êvarê bibe!
Wax wax!	Wax wax, belangazê dê niha chi bike!
Wey!	Wey, te chima berê ji min ra negot!
Wîsh!	Wîsh, ma ew dîn bûne!

...

Bangpeyvên sirîshî:

Heng! hengeheng, hengehenga...
Ving! vingeving, vingevinga...
Zing! zingezing, zingezinga...
Ting! tingeting, tingetinga...
Tep! tep tepa...
Pat! pat pata...
Tik tik! tik tika...

...

PÊSHEK Û PÊVEK

Pêshek û pêvekên ku peyvên nû pê tên chêkirin, di Kurdî da gelek in. Ew li jêr, ligor fonksîyonên xu, hatine besh kirin.

Pêshek:

Pêshekên ku pê *karpeyvên sazber* tên chêkirin:

ba-, da-, hil-, ra-, tê-, têk-, ve-, vê-, wer-

badan, bakirin; dadan, daketin; hildan, hilweshîn; rabûn, razan; têchûn, têngîhîştin; têkbirin, têkchûn; vedan, vekirin; vêketin, vêxistin; werdan, wergerandin...

î-: bi vê pêshekê salixpeyvên jêrîn hatine chêkirin:

îcar, îro, îshev, îsal

Pêshêkên ku pê *navên gishtî* tên chêkirin:

a-, de-, he-

adar, aheng, alav, aram, axur; debar, demar; heder, hegal, herêket...

Pêvek:

Pêvekên ku pê *navên gishtî* jibo mirovan tên chêkirin:

-al, -am, -ar, -baz, -bend, -dar, -de, -e, -eng, -ek, -er, -gîn, -(i)k, -î, -mend, -ok, -onek, -van, -yar

betal, tiral; zilam, xulam; fîrar; dekbaz, fêlbaz; sazband, nalband; deyndar, guhdar; qûnde; xande, zane; leheng, pêsheng; parsek, virrek; parêzer, têkosher; lezgîn, xemgîn; reshik, berdevk; gundî, mirî, xadî; dewlemend, karmend; serok, zarok; bizdonek, tirsonek; berxvan, helbestvan; dadyar, hishyar, karyar...

Pêvekên ku pê *salixnav* tên chêkirin:

-anî, -bar, -dar, -ha, -îng -kî, -(y)în

rojanî, salanî; guherbar, herikbar; berdar, dengdar; baha, niha (nû + ha, deng guherîye); bajarkî, sergêjkî; girîng; îroyîn, jêrîn, rengîn, yekîn, duyîn...

Pêvekên ku pê *navên gishtî* tên chêkirin:

-al, -am, -(h)ar, -anî, -asî, -ayî/-ahî, -che, -dank, -dar, -de, -e, -ek, -geh, -(i)stan, -(i)k, -(y)î, -ok, -onek, -tî, -yar

gopal, kendal; kilam; bahar, guhar, gotar, dewar; kechanî, mêranî; kêmasî, tengasî; dirêjayî/dirêjahî, dûrayî/dûrahî; parche, xalîche; berdar, karpeyv; chaydank, guldank;

perde; hefte, pere; pêshek, pêvek; balafîrgeh, sitargeh;
daristan, goristan; berchavk, lepik, lîstik, qijik, navik;
bedewî, delalî, deryayî, ezmanî/asîmanî; belavok,
shûshtok; chirtonek, tishtonek; hovtî, biratî, neyartî;
biryar, kiryar...

Pêvekên ku pê *navên taybet* tên chêkirin:

-(y)î, -kî

Swêdî, Swêdkî, Fransî, Franskî, Portugalî, Portugalkî,
Spanî, Spankî, Shîlîyî, Shîlîkî, Japanî, Japankî, Polonî,
Polonkî, Afrîkayî, Amerîkayî, Asîyayî, Ewropayî...

Pêveka pichûk an shîrîn kirinê: -(i)k

jinik, kechik, lawik, rindik, berxik, shivik, tûrik, sitêrk...

TEVOKSAZÎ

Jibo ku tevok bên fam kirin, ew ligor hin rêzan saz dibin. Wekî din, ne mumkun e ku mirov tishtên ku tên gotin û nivîsîn, bikare fam bike.

parcheyên tevokê	
bi karpeyvên derbasok	bi karpeyvên nederbasok
subjekt	subjekt
objekta dîrekt	-
objekta îndîrekt	-
dem	dem
cî	cî
rewsh	rewsh
karpeyv	karpeyv
pirspeyv	pirspeyv

Di tevoksazîyê da parcheya herî girîng *karpeyv* e.

Bi chend mînakên em dê di derbarê tevoksazîyê da hin haydarî bidin:

Shîlanê ji bavê xu ra chakêtek nû kirrî.

Kê kirrî?	Shîlanê	: subjekt
Chi kirrî?	chakêtek nû	: objekta dîrekt
Ji kê ra?	ji bavê xu ra	: objekta îndîrekt
	kirrî	: karpeyv

Ger mirov di vê tevokê da *karpeyvê* wek parcheya pêshîn karneyne, mirov dikare cîyê hemû parcheyan bi her awayî biguherîne.

Shîlanê / ji bavê xu ra / chakêtek nû / **kirrî**.
Shîlanê / chakêtek nû / **kirrî** / ji bavê xu ra.
Shîlanê / chakêtek nû / ji bavê xu ra / **kirrî**.
Chakêtek nû / **kirrî** / Shîlanê / ji bavê xu ra.
Chakêtek nû / Shîlanê / ji bavê xu ra / **kirrî**.
Chakêtek nû / ji bavê xu ra / Shîlanê / **kirrî**.
Ji bavê xu ra / Shîlanê / chakêtek nû / **kirrî**.
Ji bavê xu ra / chakêtek nû / Shîlanê / **kirrî**.
Ji bavê xu ra / chakêtek nû / **kirrî** / Shîlanê...

Hemû awa rast in.

Li Amedê havînan hewa gelek germ e.

hewa	: subjekt
li Amedê	: cî
havînan	: dem
gelek germ	: rewsh
e	: karpeyv

Ger mirov di vê tevokê da *karpeyvê* tim li pash *rewshê* cî bike, mirov dikare cîyê hemû parcheyên din bi her awayî biguherîne.

Li Amedê / hewa / havînan / **gelek germ / e**.
Li Amedê / **gelek germ / e** / havînan / hewa.
Li Amedê / hewa / **gelek germ / e** / havînan.
Havînan / hewa / li Amedê / **gelek germ / e**.
Havînan / hewa / **gelek germ / e** / li Amedê.
Havînan / li Amedê / **gelek germ / e** / hewa.
Gelek germ / e / havînan / hewa / li Amedê.
Gelek germ / e / li Amedê / havînan / hewa.
Gelek germ / e / hewa / li Amedê / havînan.

Hemû awa rast in.

Pitika belengaz, jiber êsha zikê xu, shev heta sibê girîya.

pitika belengaz	: subjekt
jiber êsha zikê xu	: rewsh
shev heta sibê	: dem
girîya	: karpeyv

Ger mirov di vê tevokê da *karpeyvê* wek parcheya pêshîn karneyne, mirov dikare cîyê hemû parcheyan bi her awayî biguherîne.

Pitika belengaz / jiber êsha zikê xu / shev heta sibê / **girîya**.
Pitika belengaz / shev heta sibê / **girîya** / jiber êsha zikê xu.
Pitika belengaz / **girîya** / shev heta sibê / jiber êsha zikê xu.
Pitika belengaz / shev heta sibê / jiber êsha zikê xu / **girîya**.
Pitika belengaz / jiber êsha zikê xu / **girîya** / shev heta sibê.
Pitika belengaz / shev heta sibê / **girîya** / jiber êsha zikê xu.
Shev heta sibê / **girîya** / jiber êsha zikê xu / pitika belengaz.
Shev heta sibê / **girîya** / pitika belengaz / jiber êsha zikê xu.
Shev heta sibê / jiber êsha zikê xu / **girîya** / pitika belengaz.
Shev heta sibê / pitika belengaz / jiber êsha zikê xu / **girîya**.
Shev heta sibê / pitika belengaz / **girîya** / jiber êsha zikê xu.
Jiber êsha zikê xu / **girîya** / pitika belengaz / shev heta sibê.
Jiber êsha zikê xu / pitika belengaz / shev heta sibê / **girîya**.
Jiber êsha zikê xu / shev heta sibê / **girîya** / pitika belengaz...

Hemû awa rast in.

Delal û Zelal îro 5 km bazdane.

Delal û Zelal : subjekt
îro : dem
5 km : rewsh
bazdane : karpeyv

Ger mirov di vê tevokê da *karpeyvê* tim li pash *rewshê* cî bike, mirov dikare cîyê hemû parcheyên din bi her awayî biguherîne.

Delal û Zelal / îro / **5 km / bazdane.**
Delal û Zelal / **5 km / bazdane** / îro.
5 km / bazdane / Delal û Zelal / îro.
5 km / bazdane / îro / Delal û Zelal.
Îro / Delal û Zelal / **5 km / bazdane.**
Îro / **5 km / bazdane** / Delal û Zelal.

Hemû awa rast in.

Dapîra min a 80 salî, di berbangê da, gopal di destan da, berê xu dabû zozanan.

dapîra min a 80 salî : subjekt
di berbangê da : dem
gopal di destan da : rewsh
berê xu : objekta dîrekt
zozanan : cî
dabû : karpeyv

Ger mirov di vê tevokê da *karpeyvê* neke parcheya yekîn,
û *cî* tim li pash *karpeyvê* cîbike, mirov dikare cîyê hemû
parcheyên din bi her awayî biguherîne.

Dapîra min a 80 salî / gopal di destan da / di berbangê da / berê xu / **dabû / zozanan**.
Dapîra min a 80 salî / gopal di destan da / berê xu / di berbangê da / **dabû / zozanan**.
Dapîra min a 80 salî / berê xu / **dabû / zozanan** / di berbangê da / gopal di destan da.
Dapîra min a 80 salî / berê xu / gopal di destan da / **dabû / zozanan** / di berbangê da.
Dapîra min a 80 salî / di berbangê da / berê xu / gopal di destan da / **dabû / zozanan**.
Di berbangê da / dapîra min a 80 salî / berê xu / gopal di destan da / **dabû / zozanan**.
Di berbangê da / berê xu / gopal di destan da / **dabû / zozanan** / dapîra min a 80 salî.
Di berbangê da / gopal di destan da / dapîra min a 80 salî / **dabû / zozanan** / berê xu.
Gopal di destan da / berê xu / **dabû / zozanan** / dapîra min a 80 salî / di berbangê da.
Gopal di destan da / di berbangê da / **dabû / zozanan** / berê xu / dapîra min a 80 salî.
Gopal di destan da / dapîra min a 80 salî / **dabû / zozanan** / di berbangê da / berê xu.
Berê xu / **dabû / zozanan** / dapîra min a 80 salî / gopal da destan da / di berbangê da.

Dapîra min a 80 salî, di berbangê da, gopal di destan da, berê xu dabû zozanan...

HEJMAR/JIMAR

1	yek	21	bîst û yek
2	du	22	bîst û du
3	sê	23	bîst û sê
4	char	24	bîst û char
5	pênc	25	bîst û pênc
6	shesh	30	sî
7	heft	31	sî û yek
8	hesht	32	sî û du
9	neh	40	chil
10	deh	50	pênce
11	yanzdeh	60	shêst
12	danzdeh	70	heftê
13	sêzdeh	80	heshtê
14	chardeh	90	nod
15	panzdeh	100	sed
16	shanzdeh	200	du sed
17	huvdeh	300	sê sed
18	hîjdeh	400	char sed
19	nozdeh	500	pênc sed
20	bîst	1000	hezar

2004	du hezar û char
10.000	deh hezar
23.456	bîst û sê hezar û char sed û pênce û shesh
100.000	sed hezar
150.000	sed û pênce hezar
1.000.000	mîlyon
3.456.789	sê mîlyon û char sed û pênce û hezar û heft sed û heshtê û neh
900.000.000	neh sed mîlyon
1.000.000.000	mîlyar
1.234.567.890	yek mîlyar û du sed û sî û char mîlyon û pênc sed û shêst û heft hezar û hesht sed û nod

Jêrenot:

Jibo karanîna hejmaran li besha “NAV” binêrin!

RÊZEJIMAR

yekîn	1'în
duyîn	2'yîn
sêyîn	3'yîn
charîn	4'în
pêncîn	5'în
sheshîn	6'în
heftîn	7'în
heshtîn	8'în
nehîn	9'în
dehîn	10'în
yanzdehîn	11'în
danzdehîn	12'în
sêzdehîn	13'în
chardehîn	14'în
panzdehîn	15'în
shanzdehîn	16'în
huvdehîn	17'în
hîjdehîn	18'în
nozdehîn	19'în
bîstîn	20'în

sîyîn	30'yîn
chilîn	40'în
pênceyîn	50'yîn
shêstîn	60'în
heftêyîn	70'yîn
heshtêyîn	80'yîn
nodîn	90'în
sedîn	100'în
hezarîn	1000'în
mîlyonîn	1.000.000'în
bîst û yekîn	21'în
sed û bîst û sêyîn	123'yîn
du sed û pênceyîn	250'yîn
hezar û pênc sedîn	1500'în

NÎSHANOKÊN XANDINÊ

- ... -	bîrok
!	bangok
(	hîvik
*	sîtêr
,	westok
.	rawestok
/	xarok
-	xêz
:	cot rawestok
;	westrawestok
?	pirsok
^	kumik
'	veqetok
'...'	gotinok
...	peypeyok

a b c ch d e f g...	tîp
a e ê i î o u û	dengdar
b c ch d f g h j...	hevdengdar
xan-de-kar	tîke
xandekar	peyv
Ez xandekar im.	tevok

Hin nîshanokên matematîkî:

x	car		
/	par		
-	kêm, mînus		
+	zêde, plus		
±	kênzêde		
=	dike		
%	prosent		
$\frac{1}{4}$	charyek,	ji charan yek	(25%)
$\frac{1}{3}$	sêyek,	ji sêyan yek	(± 33,3%)
$\frac{1}{2}$	nîvî,	ji duyan yek	(50%)
$\frac{3}{4}$	charsê,	ji charan sê	(75%)
$\frac{2}{3}$	sêdu,	ji sêyan du	(± 66,6%)

LÎSTA TERMÊN RÊZIMANÎ

Kurdî

alfabet	uk: alphabet de: Alphabet fr: alphabet nl: alfabet tr: alfabe
awayê fermanîyê	uk: imperative de: Imperativ fr: impératif nl: gebiedende wijs tr: emir kipi
bangpeyv	uk: interjection de: Ausrufewort fr: interjection nl: tussenwerpsel tr: ünlem
cotbendik	uk: preposition + postposition de: Präposition + Postposition fr: préposition + postposition nl: voorzetsel + achterzetsel tr: ön ilgeç + arka ilgeç

dem	uk: tense de: Zeit fr: temps nl: tijd tr: zaman
erêyîn	uk: positive de: positiv fr: positif nl: positief tr: olumlu
forma pasîf	uk: passive voice de: Passivform fr: voix passive nl: passieve vorm tr: pasif cümleler
hejmar, jimar	uk: numeral de: Numerale fr: numéral nl: telwoord tr: sayı
karanîna hejmaran	uk: use of numbers de: fr: l'utilisation des numeros nl: het gebruik van getallen tr: sayıların kullanımı

karpeyv	uk: verb de: Verb fr: verbe nl: werkwoord tr: fiil
karpeyvva derbasok	uk: transitive de: transitiv fr: transitif nl: overgankelijk ww. tr: geçişli fiil
karpeyvva nederbasok	uk: intransitive de: intransitiv fr: intransitif nl: onovergankelijk ww. tr: geçişsiz fiil
karpeyvva sazber	uk: prefix verb de: zusammengesetztes Verb fr: composé verbe nl: samengesteld ww. tr: bileşik fiil
karpeyvva veqetbar	uk: separable prefix verb de: trennbar Verb fr: séparable verbe nl: scheidbaar ww. tr: ayrılabilir fiil

mêjedem	uk: past de: frühere Zeit fr: temps passé nl: verleden tijd (algemeen) tr: geçmiş zaman
mêjedema chîrokî	uk: past perfect de: Plusquamperfekt fr: plus-que-parfait nl: v.v.t. tr: mişli geçmiş zamanın hikayesi
mêjedema nêzîk	uk: present perfect de: Perfekt fr: passé composé nl: v.t.t. tr: di'li geçmiş zaman
nav	uk: noun de: Substantiv fr: substantif nl: zelfstandig naamwoord tr: isim
navê bêalî	uk: neutral noun de: sächliches Substantiv fr: substantif neutre nl: onzijdig znw. tr: nötral isim

navê gishtî	uk: appellative, common noun de: Substantiv fr: substantiv nl: soortnaam tr: cins isim
navê mêyîn	uk: feminine word de: weibliches Substantiv fr: mot féminin nl: vrouwelijk woord tr: dişil isim
navê nêrîn	uk: masculine word de: männliches Substantiv fr: mot masculin nl: mannelijk woord tr: eril isim
navê taybet	uk: proper noun de: Eigenname fr: nom propre nl: eigennaam tr: özel isim
neyîn	uk: negation de: negativ fr: négatif nl: ontkenning tr: olumsuz

neyînîya karpeyvan	uk: negation of verbs de: fr: nl: ontkenning van ww. tr: fiillerin olumsuzluk hali
nîshanokên xandinê	uk: punctuation marks de: Betonungszeichen fr: signes de ponctuation nl: leestekens tr: okuma işaretleri
nûdem	uk: simple present de: Präsens fr: présent nl: o.t.t. tr: şimdiki zaman
nûdema chîrokî	uk: simple past de: Präteritum fr: imparfait nl: o.v.t. tr: şimdiki zamanın hikayesi
objekt	uk: object de: Objekt fr: objet nl: voorwerp tr: nesne

objekta dîrekt	uk: direct object de: direktes Objekt fr: objet direct nl: lijdend voorwerp tr: dolaysız nesne
objekta îndîrekt	uk: indirect object de: indirektes Objekt fr: objet indirect nl: meewerkend voorwerp tr: dolaylı nesne
peyv	uk: word de: Word fr: mot nl: woord tr: sözcük
peyva sazber	uk: compound word de: zusammengesetzt Word fr: composé mot nl: samengesteld woord tr: bileşik sözcük
peyva xuber	uk: independent word de: selbständig Word fr: indépendamment mot nl: zelfstandig woord tr: basit sözcük

pêlika bêhempa	uk: superlative de: Superlativ fr: superlatif nl: overtreffende trap tr: en üstünlük derecesi
pêlika yekîn	uk: comparative de: Komparativ fr: comparatif nl: vergrotende trap tr: artıklık derecesi
pêlikên hevberîyê	uk: degrees of comparison de: Steigerungsstufen fr: degrés de comparaison nl: trappen van vergelijking tr: kıyaslama dereceleri
pêshbendik	uk: preposition de: Präposition fr: préposition nl: voorzetsel tr: ön ilgeç
pêshedem	uk: present future de: Futurum fr: futur nl: o.t.t.t. tr: gelecek zaman

pêshedema chîrokî	uk: past future de: fr: futur du passé nl: o.v.t.t. tr: gelecek zamanın hikayesi
pêshedema dûr	uk: present future perfect de: fr: futur antérieur nl: v.t.t.t. tr: mişli geçmiş zamanın geleceği
pêshedema dûr a chîrokî	uk: past future perfect de: fr: futur antérieur du passé nl: v.v.t.t. tr: mişli geçmiş zamanın geleceğinin hikayesi
pêshek	uk: prefix de: Präfix fr: préfixe nl: voorvoegsel tr: önek
pêvek	uk: suffix de: Suffix fr: suffixe nl: achtervoegsel tr: sonek

pirspeyv	uk: interrogative pronoun de: Interrogativ fr: pronom interrogatif nl: vragend vnw. tr: soru zamiri
rêzejimar	uk: ordinal number de: Ordinalzahl fr: nombre ordinal nl: rangtelwoord tr: sıra sayısı
rêziman	uk: grammar de: grammatica fr: grammatica nl: grammatica tr: dilbilgisi
salixnav	uk: adjective de: Adjektiv fr: adjectif nl: bijvoeglijk nw tr: sıfat
salixpeyv	uk: adverb de: Adverb fr: Adverbe nl: bijwoord tr: zarf

subjekt	uk: subject de: Subjekt fr: sujet nl: onderwerp tr: özne
shûnnav	uk: pronoun de: Pronomen fr: pronom nl: voornaamwoord tr: zamir
shûnnavê dorkî	uk: reflexive pronoun de: Reflexivpronomen fr: pronom réfléchi nl: wederkerend vnw. tr: dönüşümlü zamir
shûnnavê hevbendîyê	uk: relative pronoun de: Relativ fr: pronom relatif nl: betrekkelijk vnw. tr: bağlantı zamiri
shûnnavê kesanî	uk: personal pronoun de: Personalpronomen fr: pronom personnel nl: persoonlijk vnw. tr: şahıs zamiri

shûnnavê nenas	uk: indefinite pronoun de: Indefinitpronomen fr: pronom indéfini nl: onbepaald vnw. tr: belirsiz zamir
shûnnavê nîshankî	uk: demonstrative pronoun de: Demonstrativ fr: pronom démonstratif nl: aanwijzend vnw. tr: işaret zamiri
shûnnavê xadîî	uk: possessive pronoun de: Possessiv fr: pronom possessif nl: bezittelijk vnw. tr: iyelik zamiri
term	uk: term de: Terminus fr: terme nl: term tr: terim
tevok	uk: sentence de: Satz fr: phrase nl: zin tr: cümle

tevokbend	uk: conjunction de: Konjunktion fr: conjonction nl: voegwoord tr: bağlaç
tevoksazî	uk: syntax de: Satzbau fr: syntaxe nl: zinsbouw tr: cümle yapısı
tîke	uk: syllable de: Silbe fr: syllabe nl: lettergreep tr: hece